

## Çapemenî diyarker e

Rol û misyona çapemeniyê roj bi roj zêdetir tê nirxandin. Gelek caran weke hêza çaremîn jî hatiye pênasekirin. Piştî çapemeniyê înternet jî weke hêza 5emîn tê pênasekirin. Înternet bi serê xwe qadeke ku lêkolîn li ser were kirin e... ***Zinar Ronî/R-6***



## Hîkayeya Maya Lêlê

Maya Lêlê waşt ke yew gorê gedeyanê aye bibo û kewena rayîran, şana bajarê Kurdîstanî Amed û sazîyan ra ardim wazena ke mezela gedeyanê xo biveyno û bîyaro herêma Serhedî. La şer zaf giran o, neeşkena ninga xo fîno yew ca... ***Zaza Cebelî/R-9***



## Pêwendiya gotin û derûnnasiyê

Gotin ji hêla derûnnasiyê ve yek ji hêmanên herî girîng e ku têgihîştina xwebûna takekesî dişêwîne. Her wiha gotin ne tenê ji bo veguhestina agahiyê lê di navenda hebûna mirov de amûra herî bihêz a derbirînê ye... ***Adar Jiyan/R-5***


25 -31 Tebax 2025
***Hejmar:*** 297
***Buha:*** 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e


# Ziman xeta sor e

Di civîna komî syona meclisê de axaftina bi kurdî ya Dayikên Aştiyê hat astenkirin. Ev bêrêzî û nêzîkatiya li pêşberî zimanê kurdî bi tundî hat şermezarkirin. Dayika Aştiyê Nezahat Teke ku nehiştin bi kurdî biaxave wiha got: “Mirovek nikaribe bi kurdî biaxivê dê aştî çawa pêk were. Dema zimanê kurdî were qedexekirin em ê çawa di nava aştiyê de cih bigirin.”



Piştî banga “Aştî û Civaka Demokratîk” a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Tirkiye û Kurdistanê atmosfereke aramî û aştiyê ava bû. Pê ve girêdayî ji bo pêşketina pêvajoyê di bin banê Meclisa Tirkiyeyê de pêdivî bi komisyonekê hat dîtin. Di 5ê tebaxê de jî bi navê ***“Komîsyona Demokrasî, Xwîşk-Biratî û Hevgirtina Millî”*** komisyon ava bû. Di civîna 5emîn a komisyonê de Dayikên Aştiyê hatin guhdarkirin. Lê belê dayikên ku xwestin bi zimanê kurdî xwe îfade bikin, ji aliyê Serokê Meclisê û Komisyonê Nûman Kûrtûlmûş ve hatin astenkirin. Ev nêzîkatiya li pêşberî zimanê kurdî bi tundî hat şermezarkirin. Meclisa Dayikên Aştiyê ya Amedê têkildarî civîna bi komîsyonê re û nêzikbûna zimanê kurdî li avahiya ÎHDa Amedê daxuyaniyek da. Dayika Aştiyê Nezahat Teke bal kişand ser axaftina li meclisê û wiha got: “Em gelek bi kêfxweşî çûn komîsyonê. Dema em çûn komîsyonê gotin ‘Hûn nikarin bi kurdî biaxivin. Ez dayikeke kurd im. Ez dixwazim bi zimanê xwe biaxivim. Mirovek nikaribe bi kurdî biaxivê dê aştî çawa pêk were. Dema zimanê kurdî were qedexekirin em ê çawa di nava aştiyê de cih bigirin. Tirkiya min tune ye. Lê dîsa jî nehiştin bi kurdî biaxivim. Eger di nava pêvajoyê de zimanê min were qedexekirin hebûna min jî tê qedexekirin...” ***Rûpel-6***

## Divê dakeve qadê

Rêber Abdullah Ocalan ku ji 1999an ve di şertên tecrîda giran de li Girtîgeha Îmraliyê tê ragirtin, bi banga xwe ya “Aştî û Civaka Demokratîk” di 27ê Sibata 2025an de li Tirkiyeyê pêvajoyeke nû da destpêkirin. Ev bang, ku bi rêya hevdîtinên bi Şandeya DEM Partiyê re hate ragihandin, ne tenê ji bo çareseriya meseleya kurdan, her wiha ji bo avakirina civakeke demokratîk û aştiyane li Rojhilata Navîn xwedî girîngiyeke dîrokî ye. Helwesta dewletê, gavên ji bo pêşxistina vê pêvajoyê û rola Komîsyona Demokrasî, Xwîşkûbiratî û Hevgirtina Millî girîngiya vê bangê zêdetir dike... ***Felemez Ûlûg/R-6***

## Ji bo aştiyê têkoşîna 32 salan

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo ku aştiyeke bi rûmet û çareseriya demokratîk li Kurdistan, Tirkiye, Rojhilata Navîn û cîhanê pêş bikeve, ji sala 1993yan heta niha di nava têkoşîn û hewldana diyalogê de ye. Lê her ku Abdullah Ocalan destê aştiyê dirêj dike, dewlet destê aştiyê li hewa dihêle û bi lîstik û provokasyonan şer pêş dixe. Cara yekemîn di adara 1993yan de Abdullah Ocalan banga careseriyê kir û agirbesta yek alî îlan kir. Herî dawî jî di 27ê Sibatê de Ocalan bi daxuyaniyekê banga Aştî û Civaka Demokratîk kir. Ev bang wekî manîfestoya çareseriya sedsalê hat dîtin... ***Rûpel-3***

# Hêviya aştiyê ya gelan Abdullah Ocalan e

1ê Îlon Roja Aştiyê ya Cîhanê ye. Di vê rojê de hemû kesên aştîxwaz bendewariyên xwe yên aştiyê tînin ziman. Li Tirkiyeyê jî herî zêde kurd û rêxistinên kurdan ji bo şer bi dawî bibe û aştî pêk were mîtîngên girseyî pêk tînin û daxwazên xwe yên aştiyê tînin ziman. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27ê Sibata 2025an de bi banga Aştî û Civaka Demokratîk rojeva Tirkiye, Rojhilata Navîn û cîhanê guhert. Bi minasebeta 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê parazvana Mafên Mirovan û Hevseroka ÎHDê Eren Keskînê li ser sedema şer û pêvajoya aştiyê axivî. Eren Keskîn anî ziman ku sermayedar hêza xwe ji şer û tiryakê digirin, lê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di vê pêvajoyê de bi projeyên xwe bûye hêviya aştiyê... ***Hevpeyvîna Mehmet Alî Ertaş/R-4***



Li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û “Koma Aştî û Civaka Demokratîk” di 5ê Tebaxê de li parlementoya Tirkiyeyê, bi navê “Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Millî” komisyoneke ku ji 51 kesan pêk tê hat avakirin. Komîsyonê heta niha pênc civînên xwe li dar xistin. Li ser komisyonê, rê û rêbazên wê yên xebatê, li ser hevdîtina ku dê komîsyon bi Abdullah Ocalan re hevdîtinê pêk bîne, yan na û li ser rista jinan a di vê pêvajoya aştiyê de yek ji Endama Komisyonê ya Meclisê Hevberdevka HDKê û Parlementera DEM Partiyê ya Erziromê Meral Daniş Beştaş axivî û wiha got: “Abdullah Ocalan pêşeng e û xwedî wê hêzê ye ku qonaxên demokratîkbûnê pêş bixe û. Dê komisyon bi Ocalan re hevdîtinê pêk bîne....” ***Rûpel-2***

## Şêmûga azadîye

Dewlete rêxistina sinifa kapîtalîst a û têna sinifa ke wayîrê hacetanê berhemardişî ya rê xizmet kena. Sinifa kapîtalîste bi kedewerdişê bindestan pîl bena, qîymet ber ana, sermayeya xo zêdnena. Yanî dewlete heqanê bindestan nê, serdestan pawena. Coka dewlete duştê azadîye de ya. Eke bindest pabesteyê serdestî yo, eke keda bindestî yena werdene, eke bindest sermayedarî rê xizmet keno uca de azadîye çin a. Uca de koledarîye, bendeyîye û xizmetkarîye est a. Nê konteksî de dewlete vera bindestî, îqtîdarê serdestî pawena û destûr nêdana ke bindest xover bido... ***Dr. Îsmet Konak/R-9***

## Gulistan Tara rihê berxwedanê ye

Di yekemîn salvegeriya qetlîama Gulistan Tara ya ku di 23ê Tebaxa 2024an de bi rêhevala xwe ya rojnamevan Hero Bahadîn re li navçeya Seyîdsadiq a Silêmaniyê ya li Herêma Başûrê Kurdistanê, di encama êrîşên hewayî ya dewleta tirk de şehîd bû xwişka wê Dîcle Erdem axivî. Dîcle Erdem, diyar kir ku rihê wê asî bû neheqî qebul nedikir, berxwedêr bû û got ku Gulistan Tara rihê berxwedanê ye.. ***Rûpel-2***



# 'Dê komisyon bi Ocalan re hevdîtinê pêk bîne'

Yek ji endama ***"Komîsyona Demokrasî, Xwîşkûbiratî û Hevgirtina Mîllî"***, hevberdevka HDKê û parlementera DEM Partiyê Meral Daniş Beştaş destnîşan kir ku dê komisyon bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinê pêk bîne

| Rojîstan Mîtra

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27ê sibata 2025an de banga "Aştî û Civaka Demokratîk" kir û xwest ku PKK kongreya xwe pêk bîne û xwe fesix bike. Li ser vê bangê PKKê jî di 5-7ê Gulanê de li du cihên cuda bi awayekî hemwext kongreya xwe ya 12emîn li darxist û biryara xwefesixkirinê girt. Di 11ê Tirmehê de bi navê "Koma Aştî û Civaka Demokratîk" komeke gerîla bi pêşengiya hevseroka KCKê Besê Hozat bi merasîmekê çekên xwe şewitandin.

Li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û "Koma Aştî û Civaka Demokratîk" di 5ê Tebaxê de li parlementoya Tirkiyeyê, bi navê "Komîsyona Demokrasî, Xwîşkûbiratî û Hevgirtina Millî" komisyoneke ku ji 51 kesan pêk tê hat avakirin. Komîsyonê heta niha pênc civînên xwe li dar xistin. Li ser komisyonê, rê û rêbazên wê yên xebatê, em bi yek ji endama Komisyonê û hevberdevka HDKê û parlementera DEM Partiyê ya Erziromê Meral Daniş Beştaşê re axivîn.

Meral Daniş Beştaşê di destpêka axaftina xwe de ev tiştê anî ziman: "Tevahiya jiyana Rêber Abdullah Ocalan di rastiya xwe de îro jî bi awayekî şênber tê jiyîn. Hemû mijarên ku di demên borî de bi awayekî zelal anîbû ziman, îro jî weke rastiya xwe li pêşberî me ne. Em jî di nava vê rastiyê de ne. Abdullah Ocalan pêşeng e ku rabirdûya vê erdnîgariyê bi paşerojê re biguncîne û xwedî wê hêzê ye ku qonaxên demokratîkbûnê bi pêş bixe û kêmasiyên pêkanînên berê derxe holê. Ji şerê sar û vir ve gelên cîhanê bûne mijara serpêhatiyên mezin û mixabin zehmetiyên van serpêhatiyan bi awayekî bi êş dîtine. Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd jî di dilê Rojhilata Navîn de bi parzûnkirina tecrûbeyên mirovahiyê hatiye heta îro. Ji ber vê yekê pêvajoya avakirina civaka demokratîk gelek serpêhatiyan di nava xwe de dihewîne. Bêguman gelek bîranîn û bûyerên biêş jî hatine jiyîn. Ji ber vê yekê ev pêvajo hem pir bi nirx e û hem jî pir nêzî serkeftinê ye. Ji bo serkeftina vê pêvahoyê jî divê em hemû rista xwe pêkbînin û berpisiyar tevbigerên."

Meral Daniş Beştaşê bal kişand ser komîsyona bi navê "Komîsyona Demokrasî, Xwîşkûbiratî û Hevgirtina Millî" û wiha got: "Ev komîsyon li Meclîsê gihiştiye qonaxeke girîng. Weke ku birêz Ocalan jî daye xuyakirin piştî civîna sêyem a komîsyonê, qonaxeke nû ya guhdarkirina xizmên windayan ku gel bi pêwîstiyeke mezin li benda wan bû, dest pê kir. Di lîsteyên ku ji aliyê partiyên siyasî yên ku beşdarî komîsyonê bûne de, lihevkirineke girîng pêk hatiye. Ev rûniştin bi guhdarikirina xizmên windayan bi encam bû. Em pêşbînî û hedef dikin ku piştî van pêvajoyên din ên guhdarîkirinê, di nîvê meha îlonê de bi dawî bikin û xebatên çareseriyê ku armanca xwe ya sereke ya komîsyonê ye, dest pê bikin."

Meral Daniş Beştaş wiha dirêjî da axaftina xwe: "Bêşik û guman em her tiştî naxin sitûyê vê komîsyonê, lê em dizanin û di vê zanebûnê de ne ku dê ev komîsyon di avakirina aştiyê de gaveke girîng be. Her çiqas gavên berê hatin avêtin ne serkeftî bin jî, divê em qebûl bikin ku qonaxa ku îro em gihiştinê jî ji wan ezmûnan çêbûye. Mînak pêvajoya çareseriyê ya sala 2013an rastî astengiyeke mezin hat; Ji sala 2015an û vir ve gelek êş û wendahî hatin jîyîn. Van trawmayan nîşanî me dan ku rêbazên hovane pirsgirêkan çareser nakin, berovajî vê, mezin dikin. Pêvajoya îro li ser vê hişmendiyê ye û ji ber vê yekê jî bingeha vê pêvajoyê pir xurtir e. Em pir bi hêsanî dikarin bibêjin ku bandora vê pêvajoya çareseriya demokratîk a li ser gel jî li gorî berê gelekî erênîtir e. Daxwazeke mezin heye ku pêvajo bi ser bikeve, lê fikarên pê baweriyê jî hene. Ji ber vê yekê pêwîst e gavên baweriyê yên pratîk bên avêtin."

Meral Daniş Beştaşê bal kişand ser gotinên dijî pêvajoyê û got ku ev gotin û helwest neçarî tunebûnê ne û wiha pê de çû: "Ji ber ku tu rastiyeke xwe nîne, tenê gotinên jiberkirî ne. Rastî, tecrubeyên yekser e. Zarokên ji ber mayin, hewan û maşînên zirxî jiyana xwe ji dest dane hene. Rewşa ku dayîk bêyî tirsa mirinê ji bo zarokên xwe razên, biqîmet e. Mirov dikare bibêje ku em îro nêzî vê yekê ne."

**Ev Komîsyon Rêbertiyê ava kir**

Meral Daniş Beştaşê ji xebatên ku komîsyon dimeşîne ev tişt anî ziman: "Armanca komîsyonê, ne ew e ku bişkoka yekem a pêvajoyê xelet bigire. Pêvajoya "Aştî û Civaka Demokratîk" a ku ji aliyê Rêbertiyê ve hatiye avakirin, ji aliyê komîsyoneke li Meclîsê ya ku îradeya gel lê tê temsîlkirin, pir girîng e. Avakirina razîbûna civakî bi lihevkirina hevpar a nûnerên ku bi dengên gel hatine hilbijartin û bi hev re gavan biavêjin pêkan e. Ev komîsyona ku ji 51 parlementeran pêk tê, di rastiyê de mîna hevgirtina mirovan e. Armanca komîsyonê ew e ku bingehên ku gelê kurd, gelê tirk û hemû gelên li van xakan dijîn bi hev re bijîn. Bêguman muxatabê vê pêvajoyê Abdullah Ocalan e. Di rastiyê de xwefesixkirina PKKê, bêçekkirin û qonaxên pêvajoya aştiyê bi daxuyaniyên wî ve teşe girt. Kesê ku dewlet pê re hevdîtinê pêktîne Birêz Ocalan e. Ji ber vê yekê nehevdîtina vê komîsyonê ya bi Ocalan re, tê wateya binpêkirina xala yekemîn a komîsyonê. Bêguman ev jî li dijî cewherê pêvajoyê ye. Herçiqas dem, cih û format ne diyar be jî wê komîsyon teqez bi Birêz Ocalan re hevdîtinê bike. Komîsyoneke ku guhdariya bi dehan sazî û kesan kiriye, bêyî ku guh bide Birêz Ocalan, ne pêkan e ku bikaribe bi awayekî tekûz karê xwe biqedîne."



Meral Daniş Beştaşê di axaftina xwe de bal kişand ser nehevsengiya di komîsyonê de û got: "Di komîsyonê de hejmara mêran 5,5 qat ji ya jinan zêdetir e. Di warê temsîliyeta jinan de rewşeke nebaş e. Ji bilî Partiya DEMê tu partiyeke siyasî nûnertî û temsîlîyeta jinan esas negirt. Nûnertiya wekhev a jinan ku nîvê civakê pêk tînin, dikare di pêvajoya aştiyê de gelek tiştan biguherîne. Mînak li Kolombiyayê kotaya jinan hat bicihanîn û Koalîsyona Jinan di pêvajoya li Îrlandaya Bakur de kedeke mezin da. Herwiha em bi tevkariya ku nûnertiya jinan di pêvajoya aştiyê de bide dizanin. Her çend em bi hejmara xwe kêm bin jî, divê kes gumanê neke ku em ê hemû hewldanên xwe bidin ji bo ku pêvajo li gorî destkeftiyên jinan pêş bikeve xebatên xwe bimeşînin û rista xwe jî bilîzin."

Meral Daniş Beştaşê di berdewamiya heman mijarê de ev tişt got: "Jin di dîrokê de bi awayekî sîstematîk hatine paşguhkirin. Keda wan ji nedîtî ve hatiye, vîna wan hatiye desteserkirin. Lê belê her carê ji nû ve çêbûne û bûne hêzeke ku desthilatdariya baviksalarî ji holê radike. Jin îro tenê li dijî polîtîkayên mîlîtarîst û zayendperest ên dewletê li ber xwe nadin. Di heman demê de pêşengiya avakirina pergaleke civakî ya azadîxwaz jî dikin. Birêz Ocalan jî destnîşan dike. Jin ne tenê çavkaniya hebûna civakî ne, di heman demê de hilgira têkoşîna azadiyê ne. Ji ber vê yekê pêvajoya aştiyê rasterast bi têkoşîna jinan re tê girêdan. Her pêvajoyeke ku dê berhema dîplomasiya serdest a mêr be, dê ne temam be. Aştiya rast, demokrasî û azadî tenê dema ku hemû pêkhateyên civakê di nav xwe de bihewîne wate dibîne. Jin dikarin gelek tiştan biguherînin. Dê li şûna siyaseta populîst xebatên rast û berhemdar ên ku civakê hembêz dikin bihata meşandin. Çalakbûna jinan tê wê wateyê yên ku êş û pirsgirêkan kûr hîs dikin dikarin vê pêvajoyê bi awayekî rêkûpêk bi rê ve bibin. Ev tê wê wateyê ku siberoja ku em bêriya wê dikin, dê bi destên jinan û bi rûmeteke mezin ji nû ve çêbibe. Rojeva herî giran a welat pirsgirêka jinan e. Polîtîkayên ewlehiyê sedema herî girîng a vê yekê ne. Li Kurdistanê jin mexdûrên herî mezin ên polîtîkayên şerê taybet in. Tiryak, îstismar, kuştina jinan û tundî şopên kûr hiştine. Jin hem di aliyê civakî û hem jî di aliyê aborî de tên eciqandin."

Meral Daniş Beştaşê bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Tevgera azadiya jinan di qonaxeke xurt û hişmend de ye. Jin dengê xwe didin bihîstin, pirsgirêk di zîhniyeta ku vî dengî nabihîse de ye. Em ê bi têkoşîna xwe vê zîhniyetê biguherînin. Pêdiviya me bi "Însiyatîfa Pêdiviya Jinan bi Aştiyê Heye", heye, pêdiviya me bi TJAyê û rêxistinên din ên jinan heye. Em di wê baweriyê de ne ku dê me xurt bikin. Ew ê vê pêvajoyê bi awayekî herî rast bi jinan rave bikin û hebûna wan bi helwesta xwe ya xwedîderketinê wê bibe hêza me ya herî mezin. Em di wê baweriyê de ne ku ev jî dê me ber bi serkeftinê bibe. Jin bi deng û têkoşîna xwe pêşengiya jiyana nû dikin. Em bi hev re xurt in. Em dikarin bi şîara "Jin Jiyan Azadî" li cîhanê jiyaneke azad û wekhev a komunal ava bikin."

# 'Kameraya Gulistanê li erdê namîne'

| Xecê Şen

Gulistan Tara, yek ji xebatkara Çapemeniya Azad bû ku hemû jiyana xwe di oxira têkoşîna azadiya jinan, azadiya gelê kurd û heqîqeta dengê azadiyê de dabû. Wê di tevahiya jiyana xwe de li ber xwe da û ew bû nemira rêya heqîqeta bi wate. Gulistan Tara, di sala 1983yan de li Êlihê ji dayik bû. Perwerdehiya xwe li bajarê xwe temam kir. Ji temenê xwe yê biçûk ve, ji ber sekna xwe ya li dij neheqiyê, kesayeta xwe ya hesas û meraqdar û baweriya xwe bi hêza ragihandinê, di civaka xwe de bû kesayeteke hezkirî. Bi baweriya ku ragihandin tu pirsgirêkê bêçareserî nahêle li dijî înkar û imhaya dewletê ya li ser gelê kurd û erdnîgariya wî welatî bû dengê azadiyê. Ew piştî komploya ku di sala 1999a de li ser Rêberê Gelê Kurd Birez Abdullah Ocalan pêk tê tev li rêxistinê dibe.

Gulistan Tara di 23yê Tebaxa 2024an de bi rojnameger Hêro Bahadîn re li navçeya Seyîdsadiqê ya Silêmaniyê ya başûrê Kurdistanê, di encama êrişa hewayî ya Dewleta Tirk de hat kuştin. Li dijî kuştina Gulistan û Hêro li gelek deverên cuda yên cîhanê çalakî hatin li darxistin. Lê tevî bertekên ku pêşketin jî der barê Tirkiyeyê de tu lêpirsîn nehat destpêkirin.

Di yekemîn salvegera kuştina Gulistan Tarayê de em bi xwîşka wê Dîcle Erdemê re axivîn.

Dîcle Erdemê di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku ew û xwîşka xwe Gulistan ji hev re wek heval bûne û wiha axivî: "Ji ber ku di navbera me da salek heye em bi hev re mezin bûn. Di nava me de hevaltiyek hebû, têkîliyên me gelekî germ û xurt bûn. Ji min re him heval bû him jî xwîşk bû. Ji ber vê yekê çûyîna wê jî ji bo min gelek zor û zehmet bû. Bi rastî jî nikarim vî hestî bi çend gotinan bînim ziman, ewqas ji bo min zor e. Gulistan zarokeke pir hestiyar bû. Ji hevalên xwe pir hezdikir. Ji malbat û hevalên xwe re pir baş bû. Miroveke pir hestiyar bû. Ji ber vê yekê jî tevlibûna wê di warê hestî de bandoreke mezin li ser min û malbatê kir. Gulistan tu carî zlim qebûl nedikir. Dema ku xwîşka min Fatma û bavê min ketin zindanê jî ji me zêdetir aciz dibû û pir pirs ji me dikir û digot; "Çima ev tişt tên serê me kurdan". Di encama wan pirsan de rêxistin nas kir û kete ser rêya heqîqetê."

Dîcle Erdemê di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Em 10 xwîşk û bira bûn, 7 xwîşk 3 bira. Bavê min karmendê dewletê bû. Bavê min welatparêz bû her tim tev li çalakiyan dibû. Wî xwe ji tu çalakiyan paşve nedikişand. Dewletê ewqas zilm û zext li wî dikir jî disa jî ji bo kurdbûna xwe, çanda xwe, zimanê xwe têdikoşiya. Ew tu carî ji rêya xwe şaş nebû, dev ji têkoşîna azadiyê berneda, heta dawiya jiyana xwe têkoşiya. Dema ku bavê min sirgun kirin, ez 10 salî bûm û Gulistan jî 9 salî bû. Wê demê xwîşka min Fatma 18 salî bû kete zindanê. Xwîşka min Fatma jî 11 sala di zindanê de ma. Em her meh ji bo dîtina Fatmayê diçûn girtîgeha Sêvasê. Gulistan herî zêde jî di wan salan de li ser azadiyê kete lêgerînê."

Dîcle Erdemê bi van gotinan behsa serdema xwe ya sirgûniyê kir: "Bi rastî jî me bi her awayî zehmetiyên mezin kişandin. Me wê demê tirkî nizanî bû û Eskîşehîr ji bo me bajarekî biyanî bû. Ji ber vê yekê em zêde li wir neman. Em tenê salekî li wir man û em piştî salekî vegeriyan Êlihê. Gulistan berî ku tev li gerîla bibe, ji xwe di serî de di nava tevgera ciwanan de, di sala 1999an de xebat didan meşandin. Ew piştî komploya ku di sala 1999a de li hember Reberê Gelê Kurd Birez Abdullah Ocalan pêk hat tev li rêxistinê bû. Gulistan ji bo jinên bindest bû parêzvaneke jiyana azad. Ev jî ji bo me tiştekî bi wate û bi rûmet e."

Dîcle Erdemê di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Roja ku Gulistan çû wek duh li ber çavê min e. Tiştekî zor bû. Mirovek li mala me derket çû. Tu nizanî wê kengî jiyana xwe ji dest bide. Wê demê êrişên dewletê yên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê jî pir zêde bûn. Roja wê biçûya xatirê xwe ji min xwest. Lê nikaribû biaxive, tenê li min nihêrî û pişta xwe da min derket û çû. Gulistan pir miroveke dilpaqiş bû, bêdeng û pir jî hestiyar bû. Me heta 15 saliya wê hev du didît. Lê piştre jî her bi hevalên xwe yên rêxistinê re bû. Ruhê wê serhildêr bû neheqî qebûl nedikir. Birayê min hebû 3 salan ji me mezintir bû. Me di malê de şer dikir, Gulistanê bi tu awayî neheqî qebûl nedikir û digot; "divê ez heyfa xwe bistînim". Ewqas serhildêr û berxwedêr bû."




Dîcle Erdemê di dawiya axaftina xwe de got ku Gulistanê bi tu awayî neheqî qebûl nedikir û wiha got: "Ji xwe dema ku ket nav xebatên çapameniyê jî yekemîn hedefa wê ew bû ku zilma li ser gelê kurd tê kirin nîşanî hemû cîhanê bide. Ev karekî pir pîroz û girîng bû û ji bo wê jî ruhê xwe feda kir. Ji malbata xwe qut bû. Lê ev jî ji bo me bû jiyaneke nû. Malbateke nû hem ji xwe re û hem jî ji me re ava kir. Her çiqas me demeke dirêj jê agahî negirtibe jî, berî 6 salan li ser telefonê bi me re axivî. Di axaftina wê de jî diyar bû ku pir bi moral û keyfxweş bû û her tim bi hêvî bû. Digot; "rojên xweş û azad nêz in. Qet xwe neêşînin. Dê Kurdistan azad bibe û em ji bo wê tekoşîneke mezin dimeşînin û ev têkoşîn ne vala ye. Em wan kesên ku Gulistan kuştin şermezar dikin. Ev kuştin û xayintî li dijî dengê azadiyê û hemû mirovahiyê hatiye kirin. Belê em dizanin Gulistan şehîd ketiye, lê hevalên we jî pir zêde hene. Têkoşîna Gulistanê û kameraya wê li erdê namîne. Em dizanin kameraya wê li ser milê hevalên wê ye û ez di wê baweriyê de me ku dê tekoşîna wan berdewam bike. Bila çavên wan vekirî nemîne."

# Ji bo aştiyê têkoşîna 32 salan

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji 1993an heta niha her tim ji bo aştî û çaresariya demokratîk têkoşiya û her tim ji bo çareseriyê fikr û proje pêş xist. Lê dewletê her tim li dijî çareseriyê feraseta xwe dubare kir

| Navenda Nûçeyan



Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo ku aştiyeke bi rûmet û çareseriya demokratîk li Kurdistan, Tirkiye, Rojhilata Navîn û cîhanê pêş bikeve, ji sala 1993yan heta niha di nava têkoşîn û hewldana diyalogê de ye. Lê her ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan destê aştiyê dirêj dike, dewlet destê aştiyê li hewa dihêle û bi lîstik û provokasyonan şer pêş dixe.

Cara yekemîn di adara 1993yan de Abdullah Ocalan banga careseriyê kir û agirbesta yek alî îlan kir. Piştî şerê 1992yan, cara yekem PKKê agirbesta yek alî îlan kir.

Piştre Abdullah Ocalan, di 11ê Kanûna 1995an de ji bo rê li pêşî siyaseta demokratîk û aştiyeke bi rûmet veke, dîsa agirbesta yek alî îlan kir.

Di 6ê Gulana 1996an de dîsa ket nava hewldanên çareseriyê. Lê vê carê li dijî wî sûîqast amade kirin. Piştî vê sûîqastê dîsa hewldana wî ya aştî û çareseriyê bêencam ma.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, tevî hemû astengî û hewldanên şer dîsa lêgerîna aştiyê berdewam kir. Di 1ê Îlona 1998an de dîsa agirbesta yek alî îlan kir. Hêj agirbestê berdewam dikir, bi hevkariya dewletên emperyalîst ji Sûriyeyê hate derxistin. Di 15e Sibata 1999an de ew radestî Tirkiyeyê kirin. Piştî vê yekê PKKê diyar kir ku wan agirbesta yek alî bi dawî kiriye.

Lê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan piştî li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Tîpa F a Îmraliyê hate girtin, dîsa hewldanên xwe yên ji bo çareseriya demokrotîk berdewam kir. Li Îmraliyê di 2yê Tebaxa 1999an de dîsa bang kir. Di 1ê Îlona heman salê de dîsa agirbesta yek alî îlan kir. Di 20ê Çileya 2000an de Projeya Aştiyê, di 4ê Mijdara 2000an de Plana Lezgîn a ji bo aştî û demokrasiyê û di 19ê Hezîrana 2001ê de jî ji bo aştiyeke mayînde kete nava hewldanan û danezana lezgîn belav kir. Di 22yê mijdara 2002yan de Danezana Çareseriyê ya Lezgîn belav kir.

***Name ji nûneran re şand***

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, ji serokomar, serokê meclisê, serokwezîr, serfermandar û hemû serokên partiyên siyasî re name şandin û xwest ku pirsgirêka Kurdan bi rêya aştî û çareseriya demokratîk çareser bikin. Di nava 5 salan de li ser hewldanên aştî û çareseriyê xebitî. Lê li gel vê yekê zextên li ser Kurdan berdewam kir.

Beriya 1ê Îlona 2003an di 13ê Tebaxa 2003an de "Deklerasyona Çareserî û Lihevkirinê" a ku ji 10 xalên çareseriyê pêk dihat pêşkeş kiribû.

***Rêber Abdullah Ocalan anîbû ziman ku gava yekemîn a çareseriyê û lihevkirinê çarçovyeke demokratîk e. Ev çarçoveya demokratîk li gorî pêvajoya yekîtiya neteweyî ye jî. Ji bo vê yekê;***

***a-*** Divê astengiyên li pêş azadiya rêxistinbûn û fikrê bê rakirin. Divê rêya siyaseta demokratîk bê vekirin.

***b-*** Divê zagonên hilbijartinê yên partiyên siyasî li gorî pîvanên demokratîk ji nûve bên rastkirin.

***c-***Divê zagona rêveberiyên herêmî yên demokratîk bê derxistin û erka Rêveberiyên Herêmî yên Demokratîk bêne zêdekirin.

✓ Divê rastiya Kurd wekî bingeha rasteqîn a demokrasiyê bê qebûlkirin.

✓ Divê mafê Kurdan ên çandî bên naskirin. Divê çanda xwe azad bijîn. Divê mafê çandî û çapemeniyê bê parastin.

✓ Divê mafên gelê Kurd ên demokratîk û siyasî bi zagonan bêne parastin.

✓ Divê vegera gundan bi awayekî ewle pêk bê. Ji bo vê divê gavên siyasî, hiqûqî û zagonî bên avêtin.

✓ Divê pergala cerdevaniyê bê rakirin.

✓ Divê Zagona Tevlêbuna Demokratîk û Aştiya Civakî bê avakirin da ku kesên li çiyê, girtî û mişext bûne karibin vegerin û tev li pêvajoya demokratîk bibin.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 9ê Tebaxa 2006an de bi rêya parêzeran ji serokwezîrê wê demê Recep Tayyîp Erdogan û serokê CHPê yê wê demê Denîz Baykal re peyam şand û got; "Çareseriya pirsgirêkê bi diyalogê pêkan e."

Di 7ê Îlona 2006an de dîsa bi rêya parêzeran got; "Ez kesî venaxwînim serîrakirinê. Fermanê nadim tu kesî. Em dixwazin ev xwîn raweste û Tirkiye demokratîk bibe."

Di 2yê mijdara 2007an de dîsa Abdullah Ocalan bi rêya parêzeran got; "Ez careke din destê aştiyê dirêj dikim."

***'Pirsgirêka min çareseriya demokratîk û aştiya bi rûmet e'***

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, di 5ê tebaxa 2008an de jî got: "Pirsgirêka min çareseriya demokratîk û aştiya bi rûmet e. Ji bo aştî û çareseriya demokratîk, çi bikeve ser milê min, ez amade me. Min berê jî ji serokwezîr û serokomar Abdullah Gul re name şand. Ez hêvî dikim ku em vê pirsgirêkê çareser bikin."

Di sala 2009an de dîsa banga aştiyê kir. Lê dîsa ev bang bê bersiv ma.

Di 8ê Kanûna 2010an de dîsa banga aştî û çareseriya demokratîk kir û xwest ku parlamentoya Tirkiyeyê jî biryara aştiyê bide û xwest heqîqetê lêkolîn bikin û ronî bikin. Xwest mirina Turgut Ozal û Eşref Bîtlîs bên ronîkirin. Ocalan nexşerêya çareseriyê pêşkêşî meclisê kir.

Di 5ê Sibata 2011an de jî serokwezîr Erdogan, bi Dayikên Aştiyê re hevdîtin kir. Abdullah Ocalan wê demê ji serokwezîr xwest ku ji bo hêsirên çavan rawestin hêzên çekdar bikişîne cihekî ewle û şer rawestîne.

Di 27ê Tîrmeha 2011an de bi rêya parêzeran ev peyam da: "Min ji bo her du aliyan pêşniyar kir. Min karê wan sivik kir. Min rêya çareseriyê nişanî wan da. Ez dikarim hêj çi bikim?"

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 3ê Çileya 2013an de di hevdîtina şandeyê de got: "23 sal in ji bo aştiyê têdikoşim. Ez dîroka vê pêvajoyê wekî 'destpêka jiyana demokratîk û aştiyê' dibînim."

Di Newroza 2013an de jî bi rêya wekîla BDPê Ayla Akat Ata û hevserokê KCDê Ahmet Turk, di 3yê Adara heman salê de jî peyama çareseriya demokratîk da û got: **"Êdî dema çekan bi dawî dibe û divê pirsgrêkên li Rojhilata Navîn bi diyalog, muzakere û aştiya demokratîk çareser bibin.'** Heyetê 22 caran bi wî re hevdîtin kir û di hemû hevdîtinên xwe de ji bo çareseriya demokratîk û aştiyeke bi rûmet peyam şand.

Di 7ê Hezîrana 2013an de xwest pêvajoya diyalogê bi zagonan bê misogerkirin. Di 9ê Adara 2014an de dîsa bang li AKPê kir û got: "Bi vî şiklî dixwazin min bixapînin. Ez 40 salan tekoşiyam. Hewce be ez ê 40 salên din jî têbikoşim."

Di hevdîtina 21ê Tirmeha 2013an de jî got: "Me şer li dijî AKPê nedaye destpekirin. Me di serî de li dijî feodalîteya Kurdan û piştre jî li dijî netew dewletê daye destpêkirin. Eger aştiyeke heqîqî pêş nekeve, dê şerê heqîqî pêş bikeve."

Di hevdîtina 27ê Sibata 2015an de jî got: "Eger AKP bixwaze bibe otorite dê xwe xelas bike. Eger AKP heqîqî nebe, vê carê dê gerilla heqîqî şer bike. Eger di faşîzmê de israr bike dê şer gur bibe."

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo çareseriyê mutabakata ji 10 xalan pêk dihat pêşkêşî hikûmetê kir. Endamên heyetê, hikûmet û dewletê di 28ê Sibata 2015an de li Dolmabahçeyê Mutabakat îmze kirin. Di 22yê Adara 2015an de serokomar Erdogan li dijî Mutabakata Dolmabahçeyê daxuyanî da û got: "Ez li dijî heyeta çavdêriyê me. Ez wê civînê rast nabînim." Bi vê yekê re jî pêvajo xerab kir. Piştî vê gotina Erdogan herî dawî di 5ê nîsanê de şande çû Îmraliyê û careke din şande neçû Îmraliyê.

***Tecrîdê 8 salan dewam kir***

Piştî 8 salan hevseroka KCDê Leyla Guvenê di 8ê Mijdara 2018an de dest bi greva birçîbûnê kir. Çalakî li Tirkiyeyê belav bûn. Piştî çalakiya 200 rojan parêzer di 2yê Gulanê de piştî 8 salan cara yekem çûn Îmraliyê.

Di hevdîtina 2yê Gulanê de dîsa balkişand ser peyama Newroza 2013an û diyar kir ku ji bo çareseriya demokratîk û aştiya bi rûmet amade ye. Di hevdîtina 22yê Gulanê de jî herî dawî di hevdîtina 7ê tebaxê de jî peyam bi rêya parêzeran şand û diyar kir ku ew ji bo aştî û çareseriya demokratîk amade ye. Di hevdîtina 12ê Hezîranê de jî ev tişt anî ziman: "Kurd bê Tirk û Tirk jî bêyî Kurdan nikarin hebûna xwe berdewam bikin. Ya esasî, çareseriya siyaseta demokratîk e."

Di 19ê Tebaxê de qayim tayînî şaredariyên bajarên mezin ên Wan, Mêrdîn û Amedê hatin kirin û li aliyê din jî li başûrê Kurdistanê êrişa bi navê 'Pençe 3' dewam kir. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi dagirkirin û tunekirina Kurdan gef xwarin. Di van 5 salên dawî de li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gelek êrişên hewayî û bejayî pêk anîn. Di operasyonan de çekên kîmyewî hatin bikaranîn.

Piştî tecrîda 8 salan Parêzer herî dawî di 7ê Tebaxa 2020an de çûn Îmraliyê. Rêber Abdullah Ocalan di vê hevdîtinê de got; 'Ez ji bo çareseriyê Amade me û bang li dewletê kir ku gavên çareseriyê bavêjin."

Piştî tecrîda mutlaq a 4 salan, biraziyê Abdullah Ocalan Omer Ocalan di 23ê Cotmeha 2024an de çû Îmraliyê û bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtin kir. Rêber Abdullah Ocalan got 'Şert û merc bên avakirin ez ji bo çareseriyê amade me.' Lê êrişên li ser Rojava, tayînkirina qayiman, girtin û binçavkirin û kuştinê berdewam kir.

Di 22ê kanûna 2024an de bi rêya heyeta DEM Partiyê ji bo çareseriya pirsgirêka Kurdan û demokratîkbûna Tirkiyeyê nexşerêya ku ji 7 xalan pêk tê, danî pêşiya Meclisa Tirkiyeyê.

Di 27ê Sibatê de Rêber Abdullah Ocalan bi daxuyaniyekê banga Aştî û Civaka Demokratîk kir. Ev bang wekî manîfestoya çareseriya sedsalê hat dîtin. Ji aliyê gelê Kurd, dostên Kurdan û gelek welatên cîhanê ve pir erênî hat dîtin û bi coş hat pêşwazîkirin.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 9ê Tîrmehê de dîsa bi bangeke bidîmen de destnîşan kir ku êdî li şûna şerê çekdarî dema siyaseta demokratîk û Entegrasyona Demokratîk e. Destnîşan kir ku ew ji hêza şer bêtir, ji hêza aştî û civaka demokratîk bawer dike û israra xwe ya ji bo aştî û çareseriya demokratîk dubare anî ziman.

## Ji bo azadiyê îmzeyan kom dikin

| Sosin Gulo

Înîsiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê û Înîsiyatîfa Parêzeran a Sûriyeyê ya ji bo Parastina Rêber Abdullah Ocalan dest bi kampanya îmzeyan kirin û dê li tevahiya Sûriyeyê îmzeyan kom bikin.

Di 10ê Cotmeha 2023an de li 74 navendan ji aliyê dostên Kurdan ve pêngava "Ji Rêber Abdullah Ocalan re Azadî ji Kurdistanê re Statu" hatibû destpêkirin. Di demek kurt de ev pêngav li tevahiya cîhanê belav bû. Di çarçoveya vê pêngavê de bi milyonan îmze hatin komkirin û bi sedan civîn hatin lidarxistin. Pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi komî hatin xwendin. Meş û mîtîngên girseyî hatin lidarxistin. Piştî banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a 27ê Sibatê ya Aştî û Civaka Demokratîk di 5ê Hezîrana 2025an de Forma Azadî û Aştiyê ya Ewropayê (EFFP) li ser asta navneteweyî kampanya "Ez dixwazim bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim" dan desetpêkirin.

Înîsiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê û Înîsiyatîfa Parêzeran a Sûriyeyê ya ji bo Parastina Rêber Abdullah Ocalan têkildarî kampanyaya "Ez dixwazim bi Ocalan re hevdîtinê bikim" ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd di 20ê Tebaxê de strata kampanya îmzeyan da destpêkirin. Înîsiyatîf dê bi beşdariya akademîsyen, siyasetmedar, parazvanên mafên mirovan, oldar û serokên eşîran, ji bo azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan îmzeyan kom bikin.

**Starta kampanyayê dan**

Têkildarî kampanyaya îmzeyan Hevserokê Înîsiyatîfa Parêzeran Ji bo Parastina Rêber Abdullah Ocalan, Mihemed Emîn Niêmî anî ziman ku ev çalakî şaxeke kampanya cîhanî ye û got: "Dema kampanya cîhanî dest pê kir, li tevahiya cîhanê belav bû. Em li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê her roj jibo azadiya Rêber Apo xebatan dikin. Me di 20ê Tebaxê de bi daxuyaniyekê starta komkirina îmzeyan da. Me Înîsiyatîfa Parêzeran Ji bo Parastina Rêber Abdullah Ocalan, Înîsiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê bi hevre dest bi vê xebatê kir. Me ragihand ku em beşdarî vê pêngavê dibin. Em ê di nava 10 rojan de bi hejmareke guncav ku ji akademîsyen, çalakvanên mafên mirovan, siyasetmedar, rewşenbîr, serokên eşîr û qebîleyan, kesayetên olî îmzeyan kom bikin."

**Dê ji NY û CPT re name bişînin**

Mihemed Emîn Niêmî anî ziman ku ew ê li tevahiya Sûriyê vê xebatê bimeşînin û got: "Her kes dixwaze tev li vê pêngavê bibe. Piştî em van îmzeyan kom bikin em ê pêşkêşî Sekreterê Neteweyên Yekbûyî (NY), Yekîtiya Ewropayê, Konseya Mafê Mirovan a NYê, Rêxistina Pêşîgirtina Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT), Wezareta Edaletê ya Tirkiyeyê bikin."

**Em dixwazin biçin Îmraliyê**

Mihemed Emîn Niêmî da zanîn ku ew dixwazin ku bi lezgîn bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikin û wiha bi dawî kir: "Ji roja komployê heta niha li ser Rêber Abdullah Ocalan îşkence heye. Em ê bixwazin ku bi awayekî lezgînî em biçin bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikin. Piştî hevdîtina 23ê Cotmeha 2024an û şûnde em fêr bûn ku Rêber Abdullah Ocalan dijî. Em dixwazin biçim cem Rêber Abdullah Ocalan û fikrên xwe pêre parve bikin."

## HÊZA SERMAYEDARAN ŞER Û TIRYAK E

# Hêviya aştiyê Rêber Abdullah Ocalan e


Wenê: Esra Solin Dal

Hevseroka ÎHDê Eren Keskînê bi minasebeta 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê anî ziman ku sermayedar hêza xwe ji şer û tiryakê digirin, lê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di vê pêvajêyê de bi projeyên xwe bûye hêviya aştiyê

■ Mehmet Alî Ertaş

*1ê Îlon Roja Aştiyê ya Cîhanê ye. Di 1ê Îlona sala 1939an de Artêşa Naziyan a Adolf Hitler Polonya dagir kir. Bi dagirkirina Polonyayê Şerê Cîhanê yê Duyêm ku bû sedema mirina 50 mîlyon mirovan dest pê kir. Piştî vê yekê 1ê Îlonê, li hemû cîhanê weke "Roja Aştiyê ya Cîhanê" tê pîrozkirin. Di vê rojê de hemû kesên aştîxwaz bendewariyên xwe yên aştiyê tînin ziman.*

*Di Şerê Cîhanê yê Duyêm de 7 milyon kes di kampên mirinê de bi tevahî 50 milyon mirovî jiyana xwe ji dest da. Şer, çawa ku di roja 1ê Îlona 1939an de dest pê kir, di heman rojê de, di sala 1945an de bi dawî bû. Piştî şer, Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî ji bo ku careke din şer dest pê nekin û aştiyeke gerdûnî pêk were, 1ê Îlonê weke "Roja Aştiyê ya Cîhanê" îlan kir. Êdî ev roj, ango 1ê Îlonê, li navênden cihanê tê pîrozkirin. Li Tirkiyeyê jî herî zêde Kurd û rêxistinên Kurdan ji bo şer bi dawî bibe û aştî pêk were mîtîngên girseyî pêk tînin û daxwazên xwe yên aştiyê tînin ziman.*

*Ji 1ê Cotmeha 2024an heta niha li ser aştiya navxweşî niqaş pêş dikevin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27ê Sibata 2025an de bi banga Aştî û Civaka Demokratîk rojeva Tirkiye, Rojhilata Navîn û cîhanê guhert. Piştî banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan PKKê kongreya xwe pêk anî û xwe fesix kir. Pişt re biryara çekdanînê da. Dîsa li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a 9ê Tîrmehê, PKKê bi koma ji 30 kesan pêk dihat, bi merasimeke heybet di 11ê Tîrmehê de çek şewitandin û peyam da cîhanê. Niha jî komîsyon li meclisê hatiye avakirin û niqaşên çareseriyê û aştiyê têne kirin.*

*Bi minasebeta 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê em bi parazvana Mafên Mirovan û Hevseroka ÎHDê Eren Keskînê re li ser sedema şer û pêvajoya aştiyê axivîn.*

***Bandora Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn li ser îlankirina 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanî çiye?***

Di belgeyên navneteweyî yên li dijî şer hatine amadekirin de rista Şerê Yekemîn û Duyemîn ên Cîhanê pir girîng e. Li gel ku ewqas bedelên giran hatin dayîn, belgeyên li dijî şer hatine amadekirin têr nakin.

***Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn de sûcên şer çiqas hatin dîtin. Ku nehatin dîtin çima?***

Dema em mînakê bidin di Şerê Yekemîn û Duyemîn ên Cîhanê de gelek jin bi tacîz, tewacizê re rû bi rû man. Bi êrişên zayendî re rû bi rû man. Li gel vê yekê dadgehên leşkerî yên navneteweyî yên Nurnbergê û Tokyoyê ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn hatin sazkirin, tundiya li dijî jinan wekî sûcên şer nedîtin. Di têkoşîna li dijî şer de her dem helwesta alîgirê serdestiya mêr derket pêş. Şer û mîlîtarîzm nokteya dawî ya serdestiya mêr e. Berî her tiştî herî zêde pêdiviya jinan bi aştiyê heye. Divê berî her tiştî em vê yekê bînin ziman. Li ser vê ax û erdnîgariya me, demeke pir dirêj e şer heye. Şerên pir giran li ser vê erdnîgariyê pêk hatine.

***PKKê çima dest bi şerê çekdarî kir?***

Berî her tiştî em qala komara piştî şerê cîhanê yê yekemîn dikin. Em qala tundiya dewleta ku di 1915an de komkujî pêk anîbû dikin. Piştî vê komkujiyê; dewleta mîlîtarîst a ku yek nasname, yek bawerî û yek alê esas digire hat avakirin. Ji xeynî nasnameya musilmanên sunnî û Tirk, hemû nasnameyên din hatin redkirin û înkarkirin. Li gorî vê ferasetê dîrokeke fermî hat nivîsandin. Hemû bawerî, nasname û komên din ku li ser vê axê dijîn, an hatin tunekirin, an jî bi polîtîkayên bişaftinê ji rastiya xwe hatin dûrxistin. Li gorî nasnameya Tirkê misilman hatin entegrekirin. Yê li dijî vê înkarê ji dil û bi rastî têkoşiya Kurd bû. Gelê Kurd, ne tenê li Tirkiyeyê; di nava çar dewletên ku di nava sînorên wan de hatine parçekirin hat înkarkirin. Dewletên ku Kurd di nava sînorên xwe de parçe kirine, bandor li hev kirin. Lê sedema herî mezin a pêvajoya şer ku li ser erdnîgariya Bakur pêş ket, polîtîkaya înkar û îmhayê bû. Kesên ku PKKê sedema vî şerê ku pêş dikeve dibînin, divê mirov pirsa 'Dema Şêx Seîd û Seyîd Riza hate darvekirin, dema gorên wan ji gel hatin veşartin, dema li Kurdistanê ew qas komkujî pêk hatin, ma wê demê PKK hebû?' bipirse.

Li vir tişta ku em lêpirsîna wê bikin polîtîkayên dewletê ne. Ji ber van polîtîkayên dewletê PKKê dest bi şerê çekdarî kir.

***Li dijî şerê li Kurdistanê bertekên heyî çiqas têr dikin. Ev bertek çiqas dikarin rê li pêşiya şer bigirin?***

Li ser ax û erdnîgariya me, mixabin bîrdoziya fermî ku dewletê ava kiriye, ji aliyê piraniya gel ve jî hatiye qebûlkirin. Feraset û polîtîkaya înkarê ya Îttîhat û Terakkî ya ku ji 1915an heta niha hebûna xwe berdewam dike, mixabin ji aliyê civakê ve jî hatiye qebûlkirin. Hîna bi awayekî rast çepgirên Tirkiyeyê ji bo komkujiya 1915an nîqaşeke rast nekiriye. Ev nîşan dide ku ev kar çiqas dijwar e. Heman feraseta ku xwe wekî kesên herî şoreşger û zanistparêz nîşan didin jî, di şerê li Kurdistanê de heman seknê nîşan didin. Mirov nikare bibêje li dijî şerê li Kurdistanê bertekeke ciddî nîşan daye.

***Sendîka û rêxistinên civakî li dijî şer çiqas rola xwe pêk anîn?***

Li ser erdnîgariya me êşên pir mezin çêbûn. Gelek kes di bin çavan de ji aliyê kontr gerîla ve hatin windakirin. Cînayetên gerîla pêk hatin. Gorên komî derketin. Li gel ew qas bûyerên bi êş û giran, sendîkayên vî welatî tenê bi carekê jî ji bo aştiyê neketin greva giştî û grev bi rêxistin nekirin. Ev yek rastiyeke pir bi tirs e. Ji ber vê yekê li dijî vê înkarê tevgereke ku serî natewîne heye. Tevgera Kurd, tevgera Jinan, LGBT, hin komên sosyalîst hene. Lê ev li dijî şerê ku li ser vê erdnîgariyê tê pêşxistin tu carî têr nekir û têr nake. Ji ber têkoşîna li dijî şer û yên aştiyê dixwazin têr nakin, kesên aştiyê dixwazin jî her tim rastî tundî û zextan tên.

***Li cîhanê kî şer dixwaze û çima? Çima şer li cîhanê belav dibe? Rola hêzên ku çekan dikirin û difiroşin çiye?***

Li cîhanê hêzên ku şer dixwazin hene. Ji ber ku herî zêde hêzên emperyal û mêtinger hemû cîhanê bi rêve dibin. Sermayeya van hêzan a herî mezin jî çek û tiryak e. Ji bo çekên xwe bifiroşin şer didome. Şer pêş dixin. Li dijî vê yekê jî hiş û bedena gel bi tiryakê pûç dikin. Bi taybetî vê yekê wekî polîtîkaya mêtingeriyê zêde dixin meriyetê. Mînak, tu îro biçî kîjan bajarê Kurdistanê tiryak di asta herî jor de belav bûye. Ev ji bo welatên din jî wisa ye. Li hemû welatên ku li dijî tundî û şer têkoşîn heye, tiryakê wekî polîtîkaya dewletê pêş dixin. Tiryakê bi awayekî serbest belav dikin.

***Hêviya aştiyê hêz û fêza xwe ji ku digire. Rola Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a di hêviya aştiyê de çiye?***

Li ser erdnîgariya me şerekî didome heye. Niha hêviyeke nû ya aştiyê derket holê. Ev jî bi projeya Birêz Ocalan a nû pêş dikeve. Ev proje ji hemû civakê re hat vegotin. Ji aliyê dewletê ve jî sedema herî mezin a vê projeyê rewşa Sûriye û Rojava ye. Ji ber vê yekê, vê carê ev pêvajo ji pêvajoyên din cudatir e. Ji ber ku vê carê partiya ku nûnertiya nijadperestan dike vê pêvajoyê îdare dike. Ya ku mirovan şaş dike Dewlet Bahçelî piştgiriyê dide vê pêvajoyê. Ev jî nîşan dide ku dewlet erênî li vê projeyê dinêre. Ez bawer dikim ku dewlet jî di ferq û zanîna ku ev êdî hatiye noqteya dawî de ye. Ji ber ku êdî li Rojava Kurd hêzeke diyarker û pir girîng e. Hêza ku serî natewîne ye. Ji xeynî vê rastiyê hebûna hêzên emperyal û hebûna Îsraîlê, ev hemû Tirkiyeyê dixe nava tirsê. Ez difikirim ku geşedanên li Rojava li ser van gavên tên avêtin faktoreke gelek girîng e. Ya din jî biryara şewitandina çekan jî li Tirkiyeyê hinceta 'Lê PKK çekan bikar tîne' ji holê radike û hincetên wan ên şer pûç dike.

***Erka hêzên demokrasiyê çiye?***

Li vir êdî erk û peyvir dikeve ser milê hêzên demokrasiyê. Ev hêzên demokrasiyê çiqas erka xwe pêk tînin. Na bi qasî tê xwestin erka xwe pêk naynin. Sedemeke vê yekê bandora politîkayên dewletê ye. Bandora polîtîkayên dewletê li ser hêzên demokratîk zêde ye. Îro ji bo ev aştiya civakî pêş bikeve û aştî bibe malê civakê, divê bi taybet muxalefeta sereke, beşdarî vê pêvajoyê bibe. Tevlêbûna muxalefeta sereke ya vê pêvajoyê pir girîng e. Lê di heman pêvajoyê de jî li dijî muxalefeta sereke operasyonên girtinê hene. Îro her çiqas Ozgur Ozel civakê şaş bike û zimanekî cuda bikar bîne jî, bi giştî bingeha CHPê, tevlêbûna pêvajoyê asteng dike. Rastiyek heye, bingeha CHPê ne alîgirê tevlêbûna vê pêvajoyê ye. Tu pêşniyarên çareseriyê yên Kemalîstan tune ne. Di operasyonên li dijî CHPê de herî zêde şaredarên CHPyî tên girtin. Ev dibe sedem ku CHP beşdarî pêvajoyê nebe. Lê dewlet vê yekê wisa dixwaze. Ez bawer nakim ku dewlet zêde dixwaze CHP bibe alîgirê pêvajoyê. Li aliyê din hêzên demokrasiyê hene. Rola sendîkayan a ji bo pêvajoyê gelek girîng e. Lê di vê pêvajoyê de rola wan pir kêm e. Di rastiyê de tevgerên sendîkayan li vê pêvajoyê xwedî dernakevin. Heta niha me tu xwedîderketina tevgerên sendîkayî nedît.

***Rol û rista komîsyona ku li meclisê hatiye avakirin di pêşxistina aştiya Tirkiyeyê de çiye?***

Komîsyona ku li meclisê hatiye avakirin girîng e. Ev komîsyona ku ji wekîlan pêk tê, ji hemû pêkhateyên civakê pêk tê. Ev komîsyon li hemû beşên civakê guhdar dike. Di 20ê Tebaxê de li ÎHDê, Dayikên Şemiyê û Dayikên Aştiyê guhdar kir. Ev gelek girîng e. Ji ber ku di pêvajoya berê ya aştiyê de gavên wisa nehatin avêtin. Rewşeke wisa derneket holê. Ez dubare dibêjin, beşeke tevgera sosyalîstên Tirkiyeyê, kesên lîberal û sendîka, di rastiyê de ji bo piştgiriyê bidin pêvajoyê nakevin nava hewldanê. Ev kêmasî ye.

***Divê ji bo Îmraliyê çi bê kirin?***

Di vê pêvajoyê de tişta herî girîng ku bê kirin, bi taybetî divê deriyê Girtîgeha Îmraliyê ji saziyên civakî re bê vekirin. Bêguman divê birêz Ocalan rast e rast karibe fikrên xwe bi nûnerên saziyan û rêxistinan re parve bike. Divê bêyî ku qasid têkevin navberê, Birêz Ocalan karibe fikrên xwe bi her kesî re parve bike. Divê karibe fikrên xwe bi çapemeniyê û rêxistinên civakî re parve bike. Eger bibe xwedî van derfetan, dê piştgiriyeke pir mezin bide pêvajoyê.

***Hûn ji bo vê pêvajoyê çiqas bi hêvî ne?***

Ez li ser navê xwe û saziya xwe ne bêhêvî me. Em ne bêhêvî ne. Ev pêvajoyeke nû ye. Bi taybetî geşedanên li Rojava pir diyarker in. Ji bo aştiyê hêviyeke nû heye. Di vî milî de gelek gavên ku dewlet bavêje hene.

***Divê dewlet çi bike?***

Beriya her tiştî divê deriyê girtîgehan li hemû girtiyên siyasî bê vekirin. Divê hemû girtiyên siyasî serbest bêne berdan. Berî her tiştî divê Tirkiye biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) pêk bîne. Divê Selahattîn Demîrtaş, Osman Kavala, Fîgen Yuksekdag û hemû kesên ji ber doza Geziyê hatine girtin serbest bêne berdan. Divê astengiyên li pêş azadiya îfadeyê û azadiya ramanê bên rakirin. Divê girtiyên nexweş bên berdan. Divê Zagona Têkoşîna li Dijî Terorê (TMK) bê rakirin. Divê peymana Îstanbûlê ji nûve têxin meriyetê. Bêguman gelek daxwazên me hene. Lê em dizanin ev hemû di carekê de pêk nayên. Lê em ê hêviyên xwe biparêzin û ji bo ev daxwazên me pêk bên em bi biryar in.




## Eren Keskîn kî ye?

Di nîsana 1959an de li Bûrsayê ji dayik bû. Li Zaningeha Stenbolê beşa hiqûqê xwend û bû parêzer. Piştî bû parêzer dest bi şopandina dozên siyasî kir. Ji sala 1989an heta niha di nava rêveberiya Komeleya Mafên Mirovan de cih digire. Piştî salên 1990î gelek caran li dijî kuştina welatiyan, valakirina gundan û şewitandina gundan, şande ava kirin û ji Stenbolê hat Kurdistanê. Di têkoşîna parastina mafên mirovan de rastî êrişa çekdarî hat. Ji salên 1990î heta niha nêzî 200 doz lê hatine vekirin. Di sala 1995an de hat girtin û di 1997an de hat berdan.

# Pêwendiya gotin û derûnnasiyê

Gotin ji hêla derûnnasiyê ve yek ji hêmanên herî girîng e ku têgihîştina xwebûna takekesî dişêwîne. Her wiha gotin ne tenê ji bo veguhestina agahiyê lê di navenda hebûna mirov de amûra herî bihêz a derbirinê ye



Adar Jiyan

Di seranserê dîrokê de, mirovên beriya me bi gotinê şer dane destpêkirin, peymanên aştiyê danîne, bîr û baweriyên xwe belavkirine û nasnameya xwe ya civakî, çandî û neteweyî pêk anîne.

Teoriyên zimannasî û ragihandinê jî nîşan didin ku gotin tenê ne ji bo veguhestina agahdariyê tên bikaranîn; herwiha ji bo xurtkirina têkiliyên rojane, afirandina nasnameya çandî, civakî, neteweyî û rêxistinkirina têkiliyên di navbera kesan de jî bi kêrî mirov tên.

Gotin ji hêla derûnnasiyê ve yek ji hêmanên herî girîng e ku têgihîştina xwebûna takekesî dişêwîne. Gotinên ku takekes di zarokatiya xwe de dibihîse bingeha avahiya xwebûn û kesayetiya wî/wê jî pêk tîne. Gotin, pira herî zirav û dirêj  e ku cîhana mirov a derveyî û cîhana wî/wê ya hundirîn bi hev ve girê dide. Hin caran bi qasî destdayîneke jidil, şîrîn û nerm, hin caran bi qasî pola req û tûj e. Belê bi her awayî di gerdûna yê/ya ku dibêje û yê/ya ku dihisîne de şopa xwe dihêle. Lewre gotina me bandorê li avaniya me ya daringî, avaniya me ya daringî bandorê li bîra me, bîra me bandorê li giyanê me dike. Her gotineke erênî an jî neyînî di nava tevînekên hebûna mirov de xelekên vê zincîra bêdeng belê zexm temsîl dike. Gotin tenê ne tevzînekên deng in ku li hewayê dilerizin; awayekî vejenê ye ku hevsengiya kîmyayî ya laşê mirov, pergala rehikên wî/wê û heta livên şaneyên wî/wê di bin bandora xwe de dihêle. Gotinên erênî, dopamîn û sêrotonînên mêjî yên ku wekî norotransmîterên bextiyariyê tevdigerin, bi liv û tevger dikin. Belê gotinên neyînî kortîzolê (hormona bêhntengiyê) bilind dike û lalê mirov radike hişyariyê. Ji ber vê yekê, her gotina ku ji devê me derdikeve, têkilî jiyannasiya laşê me dibe.

Laş wekî mala bîrê ye. Diwarê wê malê çiqas tabût be, bîr jî ewqas rihet dibe. Belê gava ku laş misêwa dibin banadora gotînên neyînî û barê ramanê yê kîmyayî dîmîne odeyên wê yek bi yek tarî dibin. Raman şolî dibe, têgihan ditengije û hêvî tê perdekirin. Belê bîr jî ew kilîd e ku deriyê giyanê vedike. Mirovê/a ku bîra wî/wê ditengije, têkiliya wî/wê ji giyên tê birrîn. Ew xwe bêarmanc, bênirx û bêhêz dibîne. Ji ber wê, lerza peyvekê, herî dawî rengê giyên diguherîne. Nexwê hilbijartina gotinê, ne pirsgirêka zimên e; pirsgirêka parastina laşê me, bîra me û giyanê me ye. Kesê/a ku zimanê xwe pak dike, bîra xwe pak dike, kesê/a ku bîra xwe pak dike, giyanê xwe azad dike. Gotina herî xurt a ku mirov ji xwe re an ji kesên din re dibêje, daxwazeke xwerû, belê ya herî ji dil e. Mînak, gotina ku em dibêjin “Bila baş be!” tenê ne arezûyek e; herwiha fermaneke erênî û girîng e ku ji bo bîrê tê dayîn. Lewre her gotinek tovek e ku ji daringê ber bi giyên ve tê reşandin û mirov kîjan tovî biçîne dê fêkiyê wî tovî biçine.

Di tevahiya dîroka mirovahiyê de, gotin tenê ne hîmekî bingehîn ê ragihandinê bûye, heman demê hîmê bingehîn ê



têkiliyên civakî, çand û giyannasiya takekesî jî bûye. Bêguman, her gotinek bandoreke erênî an jî neyînî li ser derûniya mirov dike. Mirov, bi rêya wê gotinê, ramana  xwe radigihîne kesên pêşberî xwe, hestên xwe bi wan re parve dike û nirxên xwe yên civakî ji nifşekî vediguhêze nifşekî din. Ligel wê, gotin alaveke ewqas bihêz e ku hem bandor û encameke avaker û hem jî bandor û encameke wêranker pêk tîne.

Çawa ku gotinên erênî baweriya mirov xurt  dikin, gotinên neyînî jî baweriya mirov qels dikin. Di vê çarçoveyê de, divê hêza gotinê tenê ne wekî hêzeke ragihandinê; heman gavê wekî hêzeke derûnî û civakî jî bê hesibandin. Gotinên erênî hem hewesa mirov a kesane zêde dikin û hem baweriya wî/wê ya xwe bi xwe xurt dikin. Wekî nimûne, gotina  “Tu dikarî vî karî bikî” an jî “Ez bi te ewle dibim” hestên bi xwebaweriya mirov a kesane xurt dike. Belê gotinên neyînî têkiliyên mirov ên rojane qels dikin. Gotinên pesinandinê, spasdarî û minetdariyê têkiliyên mirov ên civakî pêşve dibin; belê gotinên neyînî têkiliyên mirov ên civakî diewiqînin. Gotinên erênî hêviyeke xurt didin mirov da ku ew xwe biqîmet hîs bike û hestên xwe yê aîdiyeta civakî zêde bike. Lêkolînên derûnnasiya civakî jî nîşan didin ku gotinên erênî ramaneke erênî pêk tînin û ramana erênî jî hevgirtina mirov a civakî zêde dike.

Li gor derûnnasiya erênî, gotinên erênî yên ku mirov xwe bi xwe dibêje, di rûbirûbûna  xemgînî, bêhntengî û bêqidûmiyê de jî roleke girîng pêktînin. Di gotinên erênî yên ku takekes xwe bi xwe  dibêje “Ez dikarim vî karî bikim”, fikaran kêm dike û zerengiya wî/wê ji bo rûbirûbûna neyîniyan û berxwedêriya li pêşberî dijwariyan zêde dike. Gotinên erênî û neyînî di perwerdehî û hîndekariya mirov de jî roleke girîng pêktînin. Zimanê çêker, avaker û gotinên erênî yên ku di pêvajoya perwerdehiyê de tên bikaranîn behre, karîn û cerbeziya  xwendekaran a akademîk zêde dike. Belê zimanê xeraker, rûxîner û gotinên neyînî jî behreç, jikarîn û cerbeziya xwendekaran qels dike.

Gotinên teşwîqker ên mamosteyan eleqeya ji bo pêvajoya fêrbûnê zêde dikin. Lêkolîn nîşan didin ku xwendekarên ku nirxandinên erênî werdigirin, di serketinê de jî astên bilindtir bi dest dixin. Gotinên tinazker, qerfok û biçûkdîtinê, xwebaweriya xwendekaran qels dikin û di kesayetiya wan de rûxanên pir mezin ên ku qet nacebirin pêk tînin. Bi taybetî kesên ku di zarokatiya xwe de bi berdewamî rastî rexneyan tên, di mezinatiya xwe de bi pirsgirêkên xwebaweriyê re rû bi rû dimînin. Gotinên neyînî asta fikarên mirov zêde dikin. Gotinên gefxur/tehdîdkar an tawanbarker dibin sedema zêdebûna hormonên stresê/bêhntengiyê. Di têkiliya wan ên civakî de demeke dûvdirêj dibin sedema pêşketina nexweşiyên fikarê, erê-na û gumanê.

Têgiha “tundtûjiya zimanî” zordariyeke sîstematîk a ku bi gotinên neyînî re tên derbirin, biçûkxistin, kêmdîtin, bêrûmetkirin yekparebûna derûniya mirov bi awayekî tund têk dibe. Tundîtûjiya zimanî tenê ne takekes, heman gavê civakê jî ji hev dûr dixe û vediqetîne. Gotinên  mîna “Tu famkor î “ an jî “Tu ji tiştekî re nabî” dibe sedema xwebiçûkdîtin, bêewlehî, bêqidûmî û bêqîmetiyê. Kesên ku biberdewamî bi zimanekî neyînî re rû bi rû dimînin, hestên wan ên tenêtiyê zêde dibin, ji civakê dûr diherin û metirsiya wan a bêhntengiyê dest pê dike. Lêkolînên zanistî jî nîşan didin ku gotinên erênî dibin sedema hest û hizirên erênî û hest û hizirên erênî jî dibin sedema liv, tevger û têkiliyên erênî. Herwiha gotinên neyînî dibin sedema hest û hizirên neyînî û hest û hizirinê neyînî jî dibin sedema liv, tevger û têkiliyên neyînî.

Gotin ew hêz e ku hem bandoreke avaker hem jî wêranker li ser derûniya mirov dihêle. Bandora gotinê tenê ne li ser derûniya mirov hukim dike, herwiha sînorên peyvan ên ku di têkiliyên civakî de tên bikaranîn jî diyar dike. Di derbirina gotinê de deng, awaz, zimanê laş, girêdan û desthilata axaftvan jî roleke diyarker pêktînin. Ji bo wê divê peyv, gotin, ziman û vegotin tim bi awayekî têkildar û birêkûpêk werin bikaranîn.





**1ê Îlonê**
**Roja Aştiyê ya**
**Cîhanê pîroz be!**

**Bi hêviya ku rojên xweş û azad û aştiyeke mayinde û birûmet li vî welatî bi cih bibe em 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê li hemû gelê xwe yê cefakar pîroz dikin. Gelê me bi salan e têkoşîna azadiyê dide û bedelên gelekî giran di vê rêya dûr û dirêj de dane. Em hêvî dikin ku roja 1ê Îlonê bi xwe re aştî û xweşiyê ji hemû gelên cîhanê re bîne.  Bi van hest û dilîniyan em 1ê Îlonê li hemû gelê xwe pîroz dikin...**

Meclîsa Dayîkên Aştîyê

# Çapemenî diyarker e

Rist û misyona ragihandinê êdî sereke ye. Heke li cihekî ragihandin li gorî rastiyê tevnegere divê bê zanîn ku ji hinek cihan ve tê rêvebirin. Gelek gazinc ji zimanê ragihandina Tirk hene. Xizmeta aştî û azadiyê nake


Zinar Ronî

Rol û misyona çapemeniyê roj bi roj zêdetir tê nirxandin. Gelek caran weke hêza çaremîn jî hatiye pênasekirin. Piştî çapemeniyê internet jî weke hêza 5emîn tê pênasekirin. Înternet bi serê xwe qadeke ku lêkolîn li ser were kirin e. Her wiha înternet dema ku ji çapemenî-ragihandinê re dibe zemîn hêza ragihandinê zêdetir dibe. Rewşa wê diyarkertir dibe.

Ji ber rol û misyona ragihandinê her hêzek bi qasî ku dixwaze li ser ragihandinê bandorê çêbike ewqas jî dixwaze bibe xwedî saziyeke ragihandinê. Di serî de jî desthilata polîtîk ji bo bandorê li ser civakê bike giringîyeke pir mezin dide ragihandinê.

Qanala Îngîlîstanê BBC bi 32 zimanan weşanê dike û her roj xwe digihîne bi qasî 180 milyon kesan. Her wiha li ser tora înternetê jî yek ji malpera ku herî zêde tê şopandin e. VOA (Voîce of America-Dengê Amerîka) bi zêdetirî 40 zimanan weşana tv, dîjîtal û ser tora înternetê dike. TRT bi 17 tv û 17 radyoyan di asta hemû cîhanê de bi derdora 41 ziman û zaravayan weşana satelîte û tora înternetê dike.

Di roja me de dewletên ku ne xwedî saziyeke ragihandinê bin tune ne. Mirov dikare daneyên li jor zêde jî bike. Lê bi çend daneyan xuya dike ku dewlet çiqasî li ser ragihandinê radiwestin. Hejmara tv, radyo, malper, qanalên dîjîtal êdî wisa zêde bûne ku nayên hesibandin. Gotinek heye, dibêjin dinya bi qasî ku çavê mirov dibîne biçûk bûye. Rast e. Êdî li her quncikekî cîhanê, her bûyereke diqewime tê ber destê mirovan. Dema bêalî were nêrtin, ev ji bo civakê geşedaneke baş e. Mixabin ne wisa ye. Tu dewlet an jî rêxistinên li pey desthilat û qezençkirina pereyan tevdigerin tenê ji bo



qenciya civakê karê ragihandinê nakin. Mesele BBC dema derveyî Îngîlîzî bi zimanên din weşanê dike, ne ku dixwaze zimanê gelên din pêş bikevin. Ew bi zimanên din rojeva xwe, feraset û nêzikatiya xwe radigihîne gelên din. Dibe ku artêşa Îngilistanê nikaribe bikeve mala yekî/a Ereb, lê bi rêya qanala BBC bi rihetî dikare bikeve malê. Desthilat jî bi vê rêyê dixwazin xwe bigihînin her derê.

Dewlet ji bo rol û mîsyona wê tenê bi pêşxistina ragihandinê re eleqedar nabin. Di heman demê de şêwazên kontrolkirina ragihandinê jî pêş dixin. Li her welatekî saziyeke fermî ya dewletê ku ragihandinê kontrol dike heye. Dema ne li gorî xwestekên dewlet û desthilatdarê tevgeriyan li saziyên weşanan ceza dibire. Dewlet û desthilatdar ragihandinê ji xwe re wekî rêbaza kontrolkirina civakê, manîpulekirina muxalefetê, berovajîkirina rastiyan dixebitîne.

Her wiha ji ber ku ragihandin li ser tora civakî pêş ketiye û êdî di her kêlî û cihî de dikare bigihije civakê rol û misyona wê jî guheriye. Pênaseya hêza çarem êdî têr nake. Piştî hêza zagonsazî, rêvebirî û daraz (yasama, yurutme, yargi) digotin wekî hêza çarem jî ragihandin heye. Lê niha ragihandin dikare wekî hêza yekem were pênasekirin. Ji ber ku ragihandin van her sê erkan jî bandor dike. Li gorî weşana dike helwesta wan dide guhertin. Faruk Bîldîrîcî berî hefteyekê nivîseke bi navê "Di kuştina Narîn Guranê de 12 xeletiyên medyayê ku bandor li ser darazê kirin" weşand. Di vê nivîsê de dide xuyakirin ku ragihandinê bi weşangeriya kirî bi neyînî li ser darazê bandor kiriye û di dayîna biryarê de jî tesîr kiriye. Her wiha gelek zagonên ku dixwazin werin derxistin li ser weşangeriya ku tê kirin an tên paşvekişandin an jî guhertin. Heman tişt ji bo erka rêvebiriyê jî derbasdar e.

Rol û mîsyona ragihandinê ya diyarker ji du aliyan ve divê were nirxandin: Hem erênî hem jî neyînî. Dewlet ragihandinê neyînî bi kar tîne. Di belgeya Plana Çalakiya Çokdanînê de ji bo ragihandinê nirxandineke wiha heye: "Hewce ye ku li herêman nûçegihanên AA û TRTê hebin; nûçeyên werin çêkirin, dîmenên werin kişandin bi ragihandinên din re jî werin parvekirin; çapemeniya biyanî jî bi rêya akredîtasyonê di bin çavdêriyê de were hiştin û nehêlin bikeve qadan.(...) Pêşgirtina ragihandina kuştina sivîlan, pêşgirtina nûçe û dîmenên ku hêza operasyonel ji aliyê moral ve bixe di çarçoveya berpirsiyariya personelên di rêvebiriyê de ne." Di vê belgeyê de rola ragihandinê berbiçav xuya dike. Yanî dewlet ji aliyekî ve ragihandina xwe pêş dixe, ji aliyekî ve ragihandina nêzî dewletê agahdar dike ji aliyekî ve jî ragihandina derveyî xwe by-pass dike.

Aliyê erênî yê ragihandinê jî ew e ku ragihandina derveyî dewlet û desthilatê rastiyan digihîne civakê ye. Mesela heke ev belge ji aliyê ragihandinê ve nehatibûya dayîn derewên dewletê jî eşkere nedibûn. Ev jî karê ragihandina alternatîf, karê ragihandina civakî ye. Di salên 1990î de Çapemeniya Azad bi hezaran kiryarên îşkence û wendakirinê xistin rojev. Îro ew bûne hafizayek. Niha komîsyonek li meclîsa Tirkiyeyê hatiye avakirin. Di gelek aliyan de daneyên ragihandinê wekî belge têne pêşkêşkirin. Ev tiştekî grîng e. Her wiha di belgeya Plana Çalakiya Çokdanînê de jî tê ziman ku divê nûçeyên moral dixin neyên çêkirin. Ango ragihandin li ser moral û motîvasyona civakê jî pir bandor dike. Ji zimanê bi kar tîne bigire heya dîmen û fotoyên bi kar tîne hemû li ser civakê tesîr dikin.

Bi kurtasî rol û misyona ragihandinê êdî sereke ye. Heke li cihekî ragihandin li gorî rastiyê tevnegere divê were zanîn ku ji hinek cihan ve tê rêvebirin. Îro gelek gilî û gazinc ji zimanê ragihandina Tirkan hene. Zimanekî çêker û rast nîn e. Ne xizmeta aştiyê ne jî xizmeta azadiyê dike. Heke tê xwestin ku tiştinin werin guhertin pêşî divê ji ragihandinê dest pê bike.

# Qedexeya ziman zilm e

Zafer Veşîn

Li Tirkiyeyê PKK di 27ê Mijdara 1978an de li dijî polîtîkayên înkar û îmhayê ava bû. Ji bo mafê ziman, çand, nasname û hebûna Kurdan biparêze xwest siyasetê bike. Lê bi darbeya 12ê Îlona 1980ê rê li pêş PKKê hat girtin. Ji ber vê yekê di 15ê Tebaxa 1984an de dest bi şerê çedarî kir. Ji wê demê ve Rêberê Gelê Kurd bi dehan caran agirbesta yek alî îlan kir. Xwest pirsgirêkê bi rêyên demokratîk çareser bike. Di 41 salan de PKKê hebûna gelê Kurd li cîhanê da qebûlkirin. Piştî gelê Kurd êdî li cîhanê hat qebûlkirin, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27ê Sibata 2025an banga Aştî û Civaka Demokratîk kir û mohra xwe li dîroka cîhanê xist. Anî ziman ku bi şer tu kes qezenc nake û divê pirsgirêkê bi diyalog, demokrasî û siyaseta demkratîk çareser bikin. Xwest êdî hikûmet û dewlet dest ji polîtîkayên înkar û îmhayê berdin. Lê dewleta ku di salên borî de zimanê Kurdî qedexe dikir îro em dibînin ku Komîsyona Demokrasî, Xwîşk-Biratî û Hevgirtina Millî dîsa zimanê Kurdî qedexe dike. Em dibînin ku komîsyona ji bo çareseriyê hatiye avakirin di înkara gelê Kurd de israr dike.

Dema em li çend mînakên berê û niha dinerin em dibînin ku hişmendiya hemû netew dewletan yek e û nehatiye guhertin.

Di tîrmehê de Wezareta Xwendina Bilind û Lêkolînên Zanistî ya Iraqê dersdayîn, amadekirina pirsên îmtîhanan û bersivdana wan a bi Kurdî li zanîngeh û enstîtuyên Kerkûk, Mûsil û Diyalayê qedexe kir.

Îdareya perwerde û barhênan a Parêzgeha Kirmaşanê di bexşnameyekê de axaftin bi zimanê Kurdî li hemû Xwendingeh û Qutabxaneyên parêzgeha Kirmaşan ê qedexe kir.

Di derbeya leşkerî ya 12ê Îlonê de zimanê kurdî bi fermî qedexe kirin. Di 1991an de her çend qedexeya ziman rakirin jî lê ev tenê di gotinê de ma.

Dîsa saziyên ziman û çanda Kurdî yên wek Enstutiya Kurdî ya Stenbolê, KURDÎ-DER û MKMê bi rêya KHKyên OHALê hatin girtin.

Bi rêya Qeyûman li gelek şaredariyên Kurdistanê kreş û saziyên zarokan hatin girtin. Lewheyên bi zimanê kurdî rakirin. Parq û abîdeyên ku navê navdarên kurd lêbû bi destê Qeyûman hatin xerakirin.

Di dema OHALê de dibistana Ferzad Kemanger a ku 250 xwendekarên wê hebûn, bi KHKê girtin.

Di Cotmeha 2024an de li Navçeyên Qereqoçan, Farqîn, Wan, Amed û gelek navçe û bajarên din, polîsan nivîsa "Pêşî peya" ku li ser rêyan hatibû nivîsandin tev yek bi yek jê bir.

Zabitayên Şaredariya Konakê di 1ê Tebaxê de deriyê Komeleya Çand û Ziman a Awestayê mohr kir.

Herî dawî Dayikên Aştiyê ku li ser daxwaza komîsyona ku li meclisê hatiye avakirin ji gelek bajaran çûn Enqereyê û xwestin pirsgirêkên heyî bi zimanê Kurdî bînin ziman. Lê Serokê Meclisê yê AKPî ev daxwaz red kir û zimanê tirkî li wan ferz kirine.

**Dayîk: Em jiyana bêziman qebûl nakin**

Meclîsa Dayîkên Aştiyê ya Amedê têkildarî helwesta komîsyona meclisê li Şaxa ÎHDê daxuyanî dan û bertekên xwe anîn ziman. Dayîka Aştiyê Nezahat Teke diyar kir ku dema ew çûn komîsyonê gotin 'Hûn nikarin bi kurdî biaxivin.' Lê ez dayîkeke kurd im. Ez dixwazim bi zimanê xwe biaxivim. Ku kurdî bê qedexekirin em ê çawa aştiyê pêk bînin. Ziman xeta sor e."



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Divê komîsyon dakeve qadê

Rêber Abdullah Ocalan ku ji sala 1999an ve di şertên tecrîda giran de li Girtîgeha Îmraliyê tê ragirtin, bi banga xwe ya "Aştî û Civaka Demokratîk" di 27ê Sibata 2025an de li Tirkiyeyê pêvajoyeke nû da destpêkirin. Ev bang, ku bi rêya hevdîtinên bi Şandeya DEM Partiyê re hate ragihandin, ne tenê ji bo çareseriya meseleya Kurdan, her wiha ji bo avakirina civakeke demokratîk û aştiyane li Rojhilata Navîn xwedî girîngiyeke dîrokî ye. Helwesta dewleta Tirk, gavên ji bo pêşxistina vê pêvajoyê û rola Komîsyona Demokrasî, Xwîşkûbiratî û Hevgirtina Millî girîngiya vê bangê zêdetir dike.

Piştî banga Rêber Abdullah Ocalan, di qada siyasî ya Tirkiyeyê de hêviyên nû derketin holê. Rêber Apo di vê bangê de daxwaza rawestandina çekan û fesihkirina rêxistinî ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) kir. Ev bang weke gaveke dîrokî hate nirxandin. Serokê MHPê Devlet Bahçelî ev bang bi gotina "ji serî heta binî girîng û bi qîmet e" pêşwazî kir û nirxand. Ev nêrîna Bahçelî weke nîşaneyeke erênî ya desthilatê hate dîtin.

Avabûna Komîsyona Demokrasî, Xwîşkûbiratî û Hevgirtina Millî di 5ê Tebaxê de di bin banê Meclîsa Tirkiyeyê de gaveke girîng e. Komîsyonê heta niha pênc civîn li dar xistine û di van civînan de peyamên girîng ên ji bo aştiya daîmî û çareseriya demokratîk derketine holê. Di civînên 19 û 20ê Tebaxê de, komîsyonê nêrînên Dayikên Aştiyê, Dayikên Şemiyê, rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên civakî guhdar kirin. Bi taybetî di civînên 4 û 5an de, li ser çarçoveya hiqûqî û pratîkî ya pêvajoyê hate rawestandin. Peyamên van civînan bi giranî li ser diyalogê, azadiya Rêber Apo û avakirina civakeke demokratîk bûn. Dayikên Aştiyê, Dayikên Şemiyê, rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên civakî bi daxwazên xwe yên ji bo aştî, wekhevî û hevqebûlkirinê roleke girîng pêkanîn. Lê belê, ji ber nebûna gavên şênber ên dewletê, baweriya bi vê pêvajoyê di navbera hêvî û metirsiyê de ye.

Ji bo serkeftina komîsyonê, divê daxwazên gel bi awayekî cidî werin cîbicîkirin û zîhniyeta ewlekarîperest were terikandin. Komîsyon divê di çarçoveya banga Rêber Apo de xebatên xwe bimeşîne. Rêber Abdullah Ocalan di banga xwe de bal kişand ser xalên bingehîn ên weke avakirina civakeke demokratîk, diyalog, hevqebûlkirin, wekhevî û azadiya jinan. Rêber Apo diyar dike ku aştî ne tenê bi rawestandina şer, lê bi avakirina pergaleke demokratîk a ku mafên hemû gelan diparêze, pêkan e. Di nav van xalan de, têgeha "neteweya demokratîk" girîngiyeke taybet digire. Ev têgeh civakeke pirreng û adil armanc dike ku li ser bingeha jiyana hevpar a gelên cuda, bi rêzgirtina nasname, çand û mafên wan ava dibe. Ji ber vê yekê, divê komîsyon li ser van xalan raweste û wan di pratîkê de bi cîh bike.

Di vê pêvajoya hesas de, berpirsiyariyên mezin dikevin ser milê Komîsyonê. Komîsyon divê platformeke diyalogê ya şefaf û bi beşdariya hemû aliyan (partiyên siyasî, rêxistinên civakî, rêxistinên mafên mirovan, Dayikên Aştiyê û Şemiyê hwd.) ava bike. Ev diyalog divê ne tenê di nav meclîsê de, lê bi tevlêbûna gel jî were rêvebirin da ku bawerî were avakirin. Komîsyon divê taslaxên qanûnî yên ji bo çareseriya demokratîk amade bike ku mafên çandî, siyasî û civakî yên Kurdan û hemû koman li gorî biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) û têgeha "neteweya demokratîk" biparêze.

Polîtîkayên dualî yên dewletê, weke berdewamiya êrişên leşkerî û gefên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, baweriya gel bi pêvajoyê kêm kiriye. Ji bo zêdekirina baweriyê, komîsyon divê gavên şênber bavêje, weke rawestandina êriş û gefan, berdana girtiyên siyasî û misogerkirina mafên Kurdan. Civînên komîsyonê divê bi awayekî şefaf werin rêvebirin û daxwazên civakê bi rêya platformên civakî û civînên gel werin berhevkirin û di biryaran de li ber çavan werin girtin. Her wiha, ji bo pêşxistina pêvajoyê, divê diyalogeke rasterast bi Rêber Apo re were danîn û nerînên wî werin girtin.

Komîsyona Demokrasî, Xwîşkûbiratî û Hevgirtina Millî ji bo çareseriya demokratîk xwedî berpirsiyariyeke dîrokî ye. Ji bo serkeftina vê pêvajoyê, divê zîhniyeta ewlekarîperest bi dawî bibe, bawerî were avakirin û diyalogeke şefaf bi beşdariya hemû aliyan were rêvebirin. Tenê bi vî awayî, aştî û demokrasî dikare li Tirkiye û herêmê pêk were.

# 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê pîroz be!

**Bi hêviya ku 1ê Îlonê Roja Aştiya Cîhanê jiyaneke bêşer bi xwe re bîne û em vê rojê li cîhaneke wekhev, dadmend û azad pîroz bikin.**
**Em vê rojê li hemû gelê xwe pîroz dikin...**

MED TUHAD-FED

MED TUHAD-FED

# 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê pîroz be!

**Dawiya hemû tengasiyan firehî ye, dawiya hemû şevên tarî ronahiya rojê ye û dawiya hemû şer û pevçûnan aştî ye.**
**Bi hêviya aştiyeke birûmet û mayinde em roja 1ê Îlonê li hemû gelê xwe yê fedakar û têkoşer pîroz dikin...**

MEBYA-DER

1ê Îlonê
Roja Aştiyê ya
Cîhanê pîroz be!

Em wek Tevgera Jinên Azad (TJA) baş dizanin ku ji her demê zêdetir pêdiviya jinan û ya hemû gelên bindest ên têkoşîna azadiyê didin û bi taybetî jî ya gelê kurd bi aştiyeke bi rûmet û mayînde heye.
Em hêvîdarin ku li tevahiya Cîhanê, Rojhilata Navîn û bi taybetî jî li Kurdistanê aştî serwer bibe. Bi vê minasebetê em 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê di serî de li jinan û li hemû gelan pîroz dikin...

TJA
TEVGERA JINÊN AZAD

Tevgera Jinên Azad (TJA)

1ê Îlonê
Roja Aştiyê ya
Cîhanê pîroz be!

Heke hebe jiyanek aram û azad ew jî bi aştiyê pêkan e. Ji bo aştiyê jî pêwîstî bi qenc fikirîn û qenciyê heye. Em hêvîdarin ku dê li ser vê erdnîgariyê li dijî şer û xirabiyê aştî bi ser bikeve...

DFG
Komeleya Rojnamegeran a Dîcle Firatê

Komeleya Rojnamegeran a Dîcle Firatê (DFG)



Dr. Îsmet Konak

# Şêmûga azadîye

Şaro kurd roje bi roje nêzdîyê azadîye beno. Kelaya azadîye lete bi lete yena awankerdene. Pawitoxê na kela kede danê, têkoşîn kenê û xover danê ke zulmkarî welatê xo ra bifetilnê. Şaro kurd do axirê azad bibo




Dewlete rêxistina sinifa kapîtalîst a û têna sinifa ke wayîrê hacetanê berhemardişî ya rê xizmet kena. Sinifa kapîtalîste bi kedewerdişê bindestan pîl bena, qîymet ber ana, sermayeya xo zêdnena. Yanî dewlete heqanê bindestan nê, serdestan pawena.

Coka dewlete duştê azadîye de ya. Eke bindest pabesteyê serdestî yo, eke keda bindestî yena werdene, eke bindest sermayedarî rê xizmet keno uca de azadîye çin a. Uca de koledarîye, bendeyîye û xizmetkarîye est a. Nê konteksî de dewlete vera bindestî, îqtîdarê serdestî pawena û destûr nêdana ke bindest xover bido.

Coka polîs est o, coka leşker, mehkeme, zîndan û qanûnî est ê. Nê hacetê îdeolojîkî seba pêro şarî nê, eslê xo de seba burjuwazî yan plutokrasî est ê. Na çarçewa de fîlozofo anarşîst Bakunîn nuseno ke "dewlete înkarkerdişê azadîye temsîl kena."

Sermaye ke zêdîyena, kolonîzekerdoxîye peyda bena. Rojhelatê Mîyanênî de dewletanê kolonîzekerdoxan ra yew zî Komara Tirkîya ya. Komare polîtîkaya kolonyalîste Împaratorîya Osmanî ra mêras girewte. Têkilîyanê mîyanneteweyîyan de na polîtîka eynî wext sey "kolonyalîzmo patrîmonyal" yena pênaskerdene.

Dewleta Osmanî împaratorîya feodale û dînî bîye, na çarçewa de 3 parzemînan de kolonîzekerdoxîye kerdêne, Komara Tirkîya dewleta etnosantrîst a û hemverê kêmneweteweyîyan destpêk ra heta nika polîtîkaya nîjadpereste ramite. Bitaybetî şarê kurdî zerarê "etnosentrîzmî" hîna zaf dî. Kurdîstan açarîya "land of atrocities", yanî hema hema her şaristan bî "martîropolîs". Gonî rişîyaye, doman, cinî û camêrdî raştê qirkerdişan ameyî, şaristanî rijîyayî û ameyî vengkerdene, ziwan ame serobinkerdene, kultur û nasname raştê tirkperestîye ameyî. Bikilmî serdestî Kurdîstan sey kolonî hesibna û her tewr metodo hovî şuxilna. Gelo kurdan vera na "hovîyîye" se kerd? Gelo înan vileyê xo çewt kerd yan zî zanîyê xo ronayî? Bêguman Kurdîstan teslîm nêbî, her merdim sey "custodes lîbertatis" tewrê têkoşînî bî û vera serdestî xover da.

**Hydra û Herkul**

Nuştoxo misirij Samîr Amîn vano ke "eke xoverdayîş est o, azadîye zî est a". Mîtolojîyê yunanan de cinawirêk est bî, nameyê ci Hydra (Hîdra) yo. Goreyê zelalkerdişan 9 ganê nê cinawirî est bîyî û xeylê tehlukedar bîyo.


Yew zî vera Hydrayî Herkulo ke xover dano est bî. Kurdan zî sey Herkulî vera her tewr zulm û zordestîye xover da û seba erdê xo bedelê pîlî dayî. Yew armancê kurdan est o, o zî serê erdê xo de bi şeklêko azad ciwîyayîş o. Kurdî zanê ke azadbîyayîş wayîrvejîyayîşê estîya xo yo. Têkoşîno ke bi des serrano kurdî kenê, eslê xo de têkoşînê estî yo.

**Vive la liberte**

Reyna Samîr Amîn nuseno ke pergalêko netêduşt seba merdimanê hêzdaran kar, seba zeyîfan xizanîye ber ano. Ewro kurdî wazenê ke hem Kurdîstan hem zî Tirkîya de pergalo demokratîk û hemdem bêro awankerdene.

Têkilîya hêzdar û zeyîfî têna nê pergalî de wedarîyena. Şar û bawerîyî têna nê pergalî de eşkenê azadane biciwîyê. Na serre seba kurd û pêro şaran muhîm a. Vera her tewr serdestîye ma vanê "vive la liberte (wa biciwîyo azadîye)".

# Hîkayeya Maya Lêlê



Zaza Cebelî

Maya Lêlê herêma Serhedî ra ciwîyena, wendiş û nuştişê Maya Lêlê çinî yo. La hetê sîyasetî ra zaf xurt a. Her roj telewîzyonê kurdî temaşe kena û rojname gêna. Lajê ya derê wanenê û heyana pelê peynî goştarena. Her çiqas wendiş û nuştiş çinê bo zî, hewayê profesorî zanayîşê aye est o. Çîyer laj û çîyer kêneyê Maya Lêlê estî. La Maya Lêlê mêrdeyê xo reyde pênêkena û wazena ke mêrdeyê xo verado û cîya bo. La mêrde nêwazeno ke Lêlê ra cîya bo. La Lêlê heme hewayî zaf xurt a, eynî des camêrdan ciba xora vejena. Lêlê seba ke mêrdeyê xo de pênêkena û mêrdeyê ya zî tengayî virazeno û gedanê xo û Lêlê tehdît keno. Lêlê nê warî de sîyaset kena dewre la ancî zî yew netîce nêgêna. Lêlê eyalanê xo gêna û mêrdeyê xo ca verdana, şîyena şaristanê tirkan. Ancî zî mêrde Lêlê ra, gedeyan ra fek veranêdano û her wext nerehet keno. Lêlê û gedeyî wazenê ke mêrdeyê Lêlê bikşê. Keyeyê Lêlê pêyro yew benê, vanê "ma senî pîyê xo bikşê. Nê minaqeşe de bi Homayî ra mêrdeyê Lêlê dewa xo de yew minaqaşe de hetê mêrdimanê xora yeno kiştiş". Lêlê û gedeyê ya zî yew nefes gênê, vanê "Homayî ra pîyê ma hetê sewbîna mêrdiman ra ame kiştiş, ma zî xelisîyayî". Lêlê seba ke mêrdeyê xo ameyo kiştiş dewa kena gûnya mêrdeyê xo gêna û pêameyîş virazenê. Maya Lêlê welatperwer a û gedeyê aye zî welatperwer î. Lêlê û gedeyê aye Têgêrayîşê Azadî yê Kurdan reyde têkilîye virazenê. Û embazê welatperwerî ray û ray yenê şanê keyeyê Lêlê. Kurdistan de şer gêran û her roj xortê kurdan beşdarê refê gerîlayan benê. Kênaya Lêlê wazena ke a zî beşdarê refê gerîlayan bibo û beşdarê ci bena. Yew wext ra dime kênaya bîne zî beşdarê refê gerîlayan bena. La Maya Lêlê nê warî de qet zerrîya xo tenge nêkena. Ray- ray polês û leşkerî fîrenê keyeyê Lêlê, vanê "kêneya to kora ya?", a zî vana gedeyê mi ha koyan de yê, eke şima eşkenê şorê înan bigîrê. Yew roj lajê Lêlê Misto tepişîyeno û ey dekenê hepisxane. Lêlê her hewte rayîrê hepisxanî kena mesken. Wextê pêveynayîşî de embazanê Mistoyî reyde teraqê sîyasetî ke qet yewer nêeşkeno ke vera Lêlê baş bikero.

Yew wextî ra dime Misto taxlîye beno û hepisxane ra vejîyeno yeno keye. No esna de dewleta tirke Mistoyî ra sulusê leşkerî erşawenê. Maya Lêlê, lajê xora vana "Mistoyê mi ti şo şûbeyê leşkerî û sulusê xo bigî û heqê rayîrê xo zî bigî. Ti îlahî wazenê bikewê refê gerîlayan, şo rayîrê to akerde bo. Û Misto şîyenê leşkerîya kurdan keno nê warî de vano "sereyê mi zî tik o, her wext ez wesf û wayanê to dana û şima rewşa hurmetî ra ana vîre". Misto sey xort yan camêrd beşdarê refê gerîlayan beno û xebere erşaweno Maya Lêlê ra, vano "ez sax û selîm cayê xo resayo". Maya Lêlê her roje TV temaşe kena û wendişê rojnameyî goştarena. La rewşa avereyî de Maya Lêlê çi pawena, çi yeno sereyê aye dîyar nîyo. Lêlê her wext gêrayîşê kênanê xo û lajê xo kena, qet nêeşkena înan ra yew xebere bigîro. O wext şer zaf giran o û teknolojî hewayê ewroyêne nîyo. Yew wextî ra dime xebera kênaya aye ya verêne yena û şehît bîya. Çend serran ra pey xebera kêna aye ya bîne yena, a zî şehît kewta. No esna de berê keyeyê Lêlê verî de lajê aye yo 16 serre binê kamyonî de maneno û dinyaya xo bedilneno. Teselîya Maya Lêlê lajê aye yo Mistoyî mabena. Vana sax o û sax nîyo. Wexto ke TV temaşe kena, şaristanê Roma yê Îtalya de yew çalakî de yew xortî veynena, vana "îno Mistoyê min o". Kêfê aye yeno û xo teselî kena. Hîne wext vêreno, Mistoyî ra yew xebere nêvejîyena . Badî yew cayî ra xebere gêna, Misto zî kewto kerwanê şehîdan. Zerrîya Maya Lêlê zaf pêt a, kêwanê qay qesba asnênina. La Maya Lêlê vana ke yew gorê gedeyanê aye bibo. Lêlê kewena rayîran. Zerrîya Maya Lêlê de hîrê estareyî asmên ra kewenê. Kêvatê qay zerrîya Lêlê asnênin ra ya. Her roj hewnê Lêlê, verdişê û veyşaneyîya aye senî vîyartê nêzanê. Maya Lêlê waşt ke yew gorê gedeyanê aye bibo û kewena rayîran, şana bajarê Kurdîstanî Amed û sazîyan ra ardim wazena ke mezela gedeyanê xo biveyno û bîyaro herêma Serhedî. La şer zaf giran o, neeşkena ninga xo fîno yew ca. Hînê teselîya aye kewena. Lêlê vana "ez ameya bajarê Amedî û ez sazîyan zîyaret bikera". Şana rojnameyê kurdî, cenî û kênekî hetê aye ra kom benê. Cenî rewşa henekî ra Lêlê ra vanê "îno germê amnanî ra inî çi kincî to pira girotî?" Lêlê cewabê înan dana, vana "wele be şima ro, şima kincê sosyetîkî pirayê girotî û xo rût kerdo. Şima çi bêj rojnamegerê kurdî yê. Maya Lêlê kincê gelêrî û kurdî piray girotî, fesa kofîya a û mexmela xora xo xemilnabe hewayê canika canikan. Lêlê hînê bajarê tirkan ra bare kena şîyena herêma xo Serhedî û emrê aye ke mendo wazena dewa xo de biciwîyo û gama ke gedeyê aye yenê vîrê ci, boya koyanê Serhedî ra gedeyanê xo û embazanê înan yad bikero.




## Modelê komunî: Dewa Carûdîyê

Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalan hertim analîzanê xo de behsê komunalîzmî keno. Komelo ke wayîrê cuya hempar o û berhemardişê komunalî yo, raver şino. Na çarçewa de Kurdîstan de warê cuya hempare de tayê gamê balkêşî erzîyenê. Nê gaman ra yew dewa Carûdîyê de erzîyaye.

Dewa Carûdîyê ya Dêrikî bi rayîrê cuya komunale modelêkê komelê rêxistî yo. No modelo ke 13 serran verî ronîyayo, bingeyê xo perspektîfê modernîteya demokratîke yê Rayber Apoyî ra gêno.

Dewijanê Carûdîyê derheqê babete de qisey kerd. Mihemed Şefayo ke dewe de mamostayîye keno, pare kerd ke tarîxê dewe Babîlan ra dest pêkeno. Şefayî vat ke Rejîmê Baasî dest nayêne erdê înan ser la Şorişê Rojawanî reyde erazîyî ancî teslîmê dewijan ameyê kerdene. Dewe 40 banan ra yena pê û tede 200 kesî manenê. Dayîke Şerîfe Elîya 68 serrî bale ante ser ke dewijî pîya berheman arê danê û mîyanê xo de pare kenê.

Ronîştoxanê dewe fikrê komunî pawitişnameyê "Manîfestoyê Modernîteya Demokratîke" yê Rayber Apoyî ra girewt. Nameyê komunê dewe Komunê Şehîd Kanîyî yo. Kanî şehîdê dewe yo verên o.

Hemsereka Komunê Şehîd Kanîyî Nerîman Hisêne ard ziwan ke 13 serrî yo ê her roja şemeyî kombîyayîş kenê, meseleyanê xo qisey kenê, qeraran gênê û dima ke qeraran Îdareyê Xoserî de pare kenê anê ca. Hisêne da zanayene ke salonêka diqate de ê meymananê xo pêşwazî kenê. Hisêne îfade kerd ke ê pîya çopan arê danê, paştî danê yewbînan û her karî pîya kenê. Aye dîyar kerd ke dewe bingeyê xopawitişî de xo rêxistin kerdo û karê perwerdeyî zî bi hawayêko sîstematîk dewam kenê.

Vervatoxa Komîteya Ekonomî ya Komunê Şehîd Kanîyî Kawa Mihemed Delîyî îfade kerd ke ê bi zîret û heywankarîye debara xo kenê.

Dewij Mihemed Şerîf Abdulkerîmî vist virî ke pawitişê dewe erkê her kesî yo û 8 şehîdê înan est ê.

Dayîke Heyata ke sey Dadîya Şehîde Zîne şinasîyena dîyar kerd ke înan fikrê komunî Rayber Apoyî ra girewto û Rayber Apoyî reyde kurdan xo şinasnayo.

Şêxmûr Demîrkasimî bale ante yewî û paştdayîşê dewijan ser. Xeylê komê enternasyonalîstî dewe zîyaret kenê. Nînan ra kesan bi nameyê Derya ard ziwan ke cuya Carûdîyê zaf tesîrê aye kerdo.





# 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê pîroz be!



**Ji aştiyê tu kes winda nake lê belê şer êş û malwêranî ye. Ji bo bi dawiya hemû êşan û aramiya civakan pêwistiya me bi aştiyê heye. Bi hêviya hemû şerên li ser rûyê erdê bi dawî bibe, azadî û aştiyek meyînde ji bo hemû gelan were em 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê pîroz dikin...**

KASED
KADIN KÜLTÜR SANAT EDEBİYAT DERNEĞİ

Komeleya Jinan a Çand-Hûner û Wêjeyê (KASED)




# 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê pîroz be!



**Bi hêviya ku em êdî di bin siya mirinê de nejîn, aştiyeke birûmet bibe nesîbê gelê me yê berxwedêr. Em 1ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê li her kesî pîroz dikin û bi hemû hebûna xwe banga avakirina welatekî demokratîk û azad dikin...**

MKG
*Komeleya Rojnamegerên Jin a Mezopotamyayê*

Komeleya Rojnamegerên Jin ên Mezopotamyayê (MKG)


CEYLANPINAR BELEDİYESİ
1960
1 ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê
Pîroz Be !
Hevsaredarên Serêkaniyê
Uğur Kahraman / Dilan Ablay Saldanlı

xwebûn

25 -31 Tebax 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 297

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan


**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Dîroka destanan û destanên kurdî

Ji bo ku destanek çêbibe, divê civakek di serdemeke “destanî” de be ku hêmanên mîtolojîk bi xurtî bandorê li jiyana civakê bikin û bên domandin. Civakek ku destanekê biafirîne, divê xwedî kevneşopiyeke devkî be ku tê de berhemên çandî û wêjeyî nifş bi nifş bên veguheztin



Hogir Berbir



Destan, bi giştî, helbestên dirêj ên vegotina serpêhatiyên lehengî ne ku bi zimanê gelêrî, di nav kevneşopiya devkî de hatine afirandin. Ev berhem bi melodiyê tên strandin û çîrokên bêhempa yên lehengên awarte vedibêjin. Bi pênaseyeke hêsan, destan berhemeke wêjeyî ye ku di nav kevneşopiyeke zimanî de xwe daye der. Bêyî hebûna vê kevneşopiya wêjeyî, destan jî nikare hebe. Hin kurtejiyînên bûyeran ku wekî “destanên devkî” hatine tomarkirin, dibe ku bermahiyên destanên jibîrkirî bin, an jî celebeke din a vegotina gelêrî be, mîna efsane an dîroka devkî. Şirovekirina van kurtenivîsan wekî destan nêzîkatiyeke “hîpotetîk” e, ne bi temamî li ser bingeha “metnê” ye. Lê belê, bûyerên ku bi şêwaza helbestî an stranî hatine vegotin, ji aliyê hin lêkolîneran ve wekî destan têne binavkirin û bi rastî jî destan in.

Tê zanîn ku peyva “destan” di piraniya çavkaniyan de, piştî pejirandina Îslamê, ji peyva farisî “dâstân” hatiye wergirtin ku bi wateya “efsaneyê” an “çîroka xweş” di zimanê kurdî de cih girtiye. Di kevneşopiya gelêrî û edebî de, peyva destan bi wateyên cihêreng û berfireh hatiye bikaranîn. Di wêjeya gelêrî de, ev têgîn hem ji bo vegotinên qehremanî yên awarte yên lehengên bênav, hem jî ji bo çîrokên gelêrî yên bi temaya evînê ku bi şêwaza helbesta “aflîkî” têne gotin, tê bikaranîn. Li Kurdistanê, vegotinên lehengî yên bênav bi motîfên awarte û temaya evînê, wekî “destanî” an “çîroka gelêrî” têne binavkirin. Hin caran jî wekî “destana sohbetê” an “dîwana mîr” têne pênasekirin ku ji aliyê dengbêjan ve, bi wateya çîrokên gelêrî, têne vegotin.

Di zimanên rojavayî de, peyvên wekî “epique”, “epopee”, “epos”, “epic” û “légende” li hemberî peyva kurdî “destan” têne bikaranîn ku çîrokên gelêrî yên bi temaya lehengiyê û motîfên awarte ne. Di erebî de, têgînên “el-sîra” û “el-ḳaḍâ” bo helbesta epîk, “el-malhama” ji bo destana olî, û “el-fliir al-malhama” ji bo şêwaza helbesta epîk têne wergirtin. Di farisî de, peyva “himsî” wekî hevwateya “destan”ê ye. Di îngilîzî de, têgînên “epic”, “epos” û “epope” bi gelemperî bo şêwaza helbesta epîk, û “destan” wekî vegotineke folklorîk a qehremanî tê pênasekirin. Di zimanên din de jî, mîna spanî (“romancero”, “cantar”, “epopeya”, “saga”), almanî (“epos”, “heldenlied”, “heldensaga”), îtalyayî (“epica”, “canzone di gesta”), portûgalî (“pos”, “popeja”) û rûsî (“byliny”), heman têgîn bi şêwazên cuda têne bikaranîn.

**Peyv û Pênaseyên Hevpar**

Epope (epopêe), wekî cureyekî wêjeyî, helbesteke dirêj e ku serpêhatiyên lehengî yên bi motîfên neasayî vedibêje. Nivîskarê navdar ê fransî Voltaire (1694-1778) epopêeyê wekî “çîroka serpêhatiyên lehengiyê di beytan de” pênase kiriye. Di pênaseyên fransî de, taybetmendiyên wekî “fiction”, “vegotin”, “helbesta dirêj”, “neasayî” û “qehremanî” derdikevin pêş. Di destanê de, şewq li paş dimîne, lê leheng û serpêhatiyên wan ên awarte di navenda vegotinê de ne. Berovajî vê, di helbesta lîrîkî de, helbestvan xwe bi hest û tevgerên xwe pênase dike.

Di zimanê fransî de, du celebên epopêeyê têne destnîşankirin; ya yekem, mîna “l’Iliade” û “l’Odyssée” ya Yewnaniya kevn, an “Gilgamêş” a Sumerî ku şahesera herî kevn a mirovahiyê ye, bi şêwazeke improvîzasyonê ji aliyê helbestvanên nenas ve hatine afirandin. Mînakên din ên wekî “Ramayana” û “Mahabharata” li Hindistanê, “Les Eddas” û “Le Scalde” li Skandinavyayê, “Chansons de Geste” li Fransayê û “Les Romanceros” li Spanyayê hene. Celeba duyemîn, berhemên nivîskarên naskirî ne ku bi şêwaza epopêeyê hatine nivîsandin. Di kurdî de, têgîna “destan”ê bi piranî bi celebê yekem ve girêdayî ye.

Destan, di hin zimanên rojavayî de, wekî têgîneke bi “epope” re têkildar tê bikaranîn, lê di fransî de ev peyv carinan ji bo şêwazên lîrîk û dramatîk jî tê wergirtin. Mînak, “Chanson de Geste” destaneke gelêrî ye ku bi tîpa “aleksandrîn” (12 tîp, bi 6+6 rawestayî) hatiye nivîsandin, bi hezaran rêzên “asonansê” vedihewîne û bi amûreke muzîkî re tê vegotin. Ev vegotin serpêhatiyên lehengiyê, yên rast an mîtolojîk, bi rengekî awarte vedibêje.

**Qonaxên Pêkhatina Destanan**

***Lêkolîn nîşan didin ku destan di bin pênc sernavên sereke de derbasî qonaxên cihê dibin:***

***1-Serdema Destanan:*** Ji bo ku destanek çêbibe, divê civakek di serdemeke “destanî” de be ku hêmanên mîtolojîk bi xurtî bandorê li jiyana civakê bikin û bi vegotineke bi tîpên zêrîn bên domandin.

***2-Kevneşopiya Devkî:*** Civakek ku destanekê biafirîne, divê xwedî kevneşopiyeke devkî be ku tê de berhemên çandî û wêjeyî nifş bi nifş bên veguheztin.

***3-Bûyer:*** Bûyereke bingehîn ku bandoreke kûr li civakê dike, bingeha destanê pêk tîne. Ev bûyer dibe serkeftin, felaket, an jî mijareke ji çandên din hatibe deynkirin ku ji aliyê helbestvanan ve bi vegotineke bingehîn hatiye çêkirin.

***4-Bard:*** Bûyera ku bandorê li civakê dike, divê ji aliyê helbestvanekî ve bibe berhemeke edebî. Ev vegotin ji aliyê dengbêj an helbestvanên din ve di nifşên cuda de tê gotin, lîstin û domandin.

***5-Tespîtkirin:*** Metna destanê ku di kevneşopiya devkî de dijî, divê berî ku civak serdema destanan biqedîne, neyê nivîsandin. Nivîsên ku piştî bidawîbûna serdema destanan hatine tomarkirin, taybetmendiya xwe ya epîk winda dikin. Mînak, hin serpêhatiyên sedsala 19’an, wekî serhildan û kurtejiyînên wan, xwedî taybetmendiyên destanî ne. Evdalê Zeynikê mînakeke berbiçav e.

**Destanên Kurdî**

Di nav destanên Kurdî de, mînakên wekî Mem û Zîn, Gilgamêş, Şahmeran, Egîdek, Cebeliyê Mîrê Hekarî, Paxir Madenê, Derwêşê Evdî û Edûlê, Siyabend û Xecê û gelekên din navdar in û wekî destanên Kurdî hatine pejirandin. Lê pirseke girîng heye; ma ji bilî nav û kurtenivîsên van destanan, metnên wan ên edebî hene? Mem û Zîn nîşan dide ku metneke edebî heye, lê ji bo destanên din, divê were pirsîn ka di warê vegotinê de xwedî metneke edebî ne.

Kurtenivîsên destanên “arkaîk” dibe ku ji agahiyên dîroka devkî an efsaneyên “etîolojîk” pêk werin. Li ser bingeha bermahiyên destaneke wenda, ne mimkûn e ku mirov bi ramaneke edebî berhemekê rawe bike. Bûyer, di hemû metnên folklorîk ên wekî efsane, fabl, çîrok, destan, pêkenok û dîroka devkî de, divê bê dîtin. Bûyereke bêmetin dibe ku bibe destan, celebeke din a vegotinê, an jî rast e rast têkeve nava rûpelên dîrokê.

Kesên ku dixwazin li ser kevneşopiya destanên kurdî biaxivin, divê vê rastiyê li ber çav bigirin; destan, li gorî taybetmendiyên jor, nivîsên edebî ne ku di nav kevneşopiyeke zimanî de xwe daye der û bi şêwazeke helbestî an stranî hatine vegotin.

# Xoşnişîn

Mûsa Şanak

Îro me ji Qereçobanê dest pê kir û çemberek xêz kir. Me bi çalakiyekê dest bi rojê kir, bi dirûşmeya “jin jiyan azadî”yê tecawîz û tundiya li ser jinan protesto kir. Em ji wir jî me çûn sersaxiya malbateka şehîdan. Ji wir jî me rêya xwe domand û me Qereçoban, Newala Sor, Qereyazî, Kişo û Xoşnişînê gîhandin hev.

Li Kişo jî sersaxiyek hebû. Kalikê şehîdekî me çûbû ser heqiya xwe. Yên ku ji bo cenaze çûbûn Stenbolê jî qezayek sivik derbaz kiribûn. Dema me bihîst ku qezazede ji Stenbolê vegeriyane, em çûn serdana wan jî.

Qonaxa me ya herî dawîn herêma Soylemezan bû. Navê navenda wan ya ku wek Soylemez dihatiye navandin hatiye guherandin, sîh-çil sal in ku ew wek “Meçîtlî”yê tê zanîn. Ew der berê nahiye bûye. Her du gundên vê herême yên di jî wek Soylemeza Jêrîn û Soylemeza Jorîn tên zanîn. Her yekê çend mezreyên xwe hene.

Em berê çûn Soylemeza Jêrîn û li malekê bûn mîvan. Navê gund çima Soylemez bû? Ji ku dihat? Wan çi ji kê vêdişart? Vî navî çend pirsên mîna yên li jorê dianîn bîra mirov. Min jî ev pirsên di hişê xwe de bi dengekî bilind bi lêv kirin û ji mazûvanê me pirsîn.

Em jê hîn bûn ku navê gund ê bi kurdî Xoşnişîn bûye. Li gund tirbeya Soylemez Baba heye. Li gel mezela wî ya jina wî û ya kurekî wî jî hebûne. Navê jina wî Xatûn bûye. Her sê mezel jî wek cîhên pîroz û bimbarek tên qebûlkirin.

Tê riwayetkirin ku di dema Osmaniyan de karwanên ku di navbera Îran û Stenbolê de diçûne û dihatine di vî gundî re derbaz dibûne. Ev der cîhê bêhnvedanê bûye.

Ji aliyekî ve wan guhdar dikim, ji aliyekî ve jî li navê gund ê bi kurdî difikirim. Xoşnişîn… Cîhê xweş ê ku lê rûdinin. Cîhê xweş ê ku bêhna xwe lê vedidin. Bi rastî jî nav û çîrokê li hev tên.

**Rûspiyê wî gundî ji wan pirs kiriye**

Xoşnişîn çawa guheriye, çawa bûye Soylemez? Kê çima ew guherandiye? Lê difikirim û ji mazûvanên xwe dipirsim. Kes nizane… Li ser vê hevalekî me berê xwe dide “gogil baba”yî û çîroka wî ji min re dixwîne. Li gorî riwayetekê, demekê şekir pir bi qîmet bûye. Peydakirina wî zor bûye. Karwanekî ku ji Îranê şekir dibiriye Stenbolê hatiye di Xoşnişînê re derbaz bûye, li wir bêhna xwe vedaye. Rûspiyê wî gundî ji wan pirs kiriye û gotiye:

-Barê we çi ye? Şekir zor dihatiye dîtin. Pir bi qîmet bûye. Ji tirsa ku dê bên şêlandin karwên rastî jê vêşartiye û gotiye:

-Xwê ye. Li ser vê bersîvê yê Rûspî gotiye:

-Ne xwê ye, lê bila bibe xwê.

Li gorî riwayetê karwan bi rê ketiye û çûye gihîştiye Stenbolê. Dema li qesrê barê xwe danîne û kontrol kirine ku çi bibînin! Şekirê wan tev bûye xwê. Siltanê Osmaniyan ji wan pirsiye û gotiye, bê ka çi qewimiye di rê de û rewş zelal kiriye. Wî ew karwan tevî barê xwê bi şûn de şandiye Xoşnişînê û ji wan re gotiye:

-Herin wî gundî, rastiyê ji wî rûspiyê bi keremet re bibêjin û wî bi xwe re bînin qesrê.

Karwan bi şûn de hatiye Xoşnişînê. Rûspiyê gûnd dîsa ji wan pirs kiriye û gotiye:

-Barê we çi ye? Karwên îcar gotiye:

-Xwê ye. Yê rûspî jî gotiye:

-Rast e, xwê ye. Lê bila bibe şekir.

Karwan Rûspiyê Xoşnişînê jî hildaye û bi xwe re aniye Stenbolê. Siltanê Osmaniyan ew li qesrê ezimandiye û xwestiye ku keremeta wî jê hîn bibe. Lê wî pirsên wî nebersîvandine. Li ser vê navê wî bûye Soylemez Baba. Wî raza xwe aşkere nekiriye. Ango serê xwe li ber padîşayê Osmaniyan netewandiye. Wisa tê famkirin ku Soylemez Baba rûspiyekî Xoşnişînê yê comerd, wêrek û fêmber e. Lewre wî him deriyê xwe ji karwanan re vekiriye û him jî serê xwe li ber padîşêh jî netewandiye.

**Mekanê Soylemez Baba**

Dema karê me bi dawî bûbû tarî daketibû ser erdê û diviya bû ku hê em biçûbana Soylemeza Jorîn jî. Mekanê Soylemez Baba li Soylemeza Jêrin bû. Pir nêzî wê mala ku em lê bûbûn mîvan bû. Lê em bi derengiyê ketibûn. Bêyî ku em biçin seriyekî lê din me berê xwe da Soylemeza Jorin. Em qasekê jî li wir man û me roj li pey xwe hişt.

Di rêya vegerê de li ser navê Soylemez Baba yê rastîn difikirim. Navê gund Xoşnişîn bû; ew jî rûspiyê, ango postnişînê vî gundî bû. Teqez navekî wî hebû; lê çi bû?

Mîna her pirsek bê bersîv, ev pirsa han jî valahiyekê ava dike di hişê min de. Nizanim ku dê ev valahî kengê û bi çi bê dagirtin…



